




*Hünerrmend
Ahmed Kaya*

Kurd mafê xwe dixwazin...

Rûpel 8-9

Gürdal Aksoy

Eşq li Kurdistanê
dest pê dike

Rûpel 4-5

S. Tan

DîE'yê sûcê
dewletê tescîl kir


Rûpel 6

A. Melik Firat

Ji bo aştî û
guherîna sîstemê

Rûpel 10

NAVEROK



Faik Bulut:
Şoreşa îro modern e



Di warê çiyageriyê de gelek
kes jiyana xwe winda kirin



Li ser "23 Nisan"ê,
Çiyê zarokên kurdan kême

Ji Xwendevanan


MIXABIN gelek kurd ji bo kûponan bi hezaran pereyên xwe dibin pê rojnameyên tirkî distînin; nabin pê rojnameyên kurdî nastînin. Ez nabêjim rojnameyên tirkî qet nestînin, lê belê gerek e em bi zimanê xwe kurdî bixwînin. Bila tîraja rojnameyên kurdî ji bigihîje sed hezaran. Belê, dinya bi pêş ve diçe, lazim e zimanê kurdî ji bi pêş ve here. Yanê rojnameyên kurdî ji bibin rojane, televîzyon (Med-TV) bibe 12 an 24 saet, radyoyên kurdî hebin. Cerdewanên kurd (cehş) çekên xwe deynin. Êdî bes e, Yezdanê mezin alîkarê me be.

ZEKÎ BAZÎDÎ/AGIRÎ

ZIVISTAN li welatê me gelek dijwar derbas dibe, wextê serê çile û kanûnan berf dibare, dar û ber serê xwe ji berfê nizim dikin, lê tu carî berf nikare ruhê wan bistîne. Ew di bin berfê de ji xwe re bêpêjin li benda biharê disekinin. Bi hatina biharê re, rojên germ dest pê dikin. Hilm û gulm ji axê radi-bîn, berfa spî di carekê de dibizde û wekî rûnê ku mirov biavêje ser sêleke sor di carekê de dihele û ji ber çavan winda dibe.

Ew dar û berên ku di bin berfê de mabûn, di carekê de, serî radikîn. Şaxên nû diavêjin, pêlên xwe vedikin û digihîjin mirazên xwe. Îcar em wekî dar û beran, berf mîna dijmin û bihar mîna şoreşê ye.

CABAR BARIŞ



Rojnemeya kurdan a pêşîn: Kurdistan

MEHMET GEMSİZ

Her civak, her netewe xwediyê rojên taybet in. Ew roj an destpêka tiştekî girîng e ji bo wî gelî an jî, di wê rojê de rûdan û qewmînên ku jîna wî gelî guherandine çêbûne. Ji bo me rojên wekî 21'ê Adarê, 15'ê Gelawêjê, 27'ê Sermawezê û hwd. pir girîng in. Yek ji wan rojan jî, 22'ê Avrêlê (nîsan) ye. Di wê rojê de rojnameya yekemîn a kurdan dest bi jîna weşaniyê kiriye; bi navê Kurdistan.

Rojnameya Kurdistan, di 22'ê avrêla 1898'an de li Qahîreya Misrê ji aliyê Mîqdad Mîthad Bedirxan ve hatiye derxistin.

Mîqdad Mîthad Bedirxan, piştî derxistina hejmara 5'an, difetile paytexta Osmanî Stenbolê. Di pey wî de, îcar Evdirehman Bedirxan alê hildigire. Rojname ji hejmara 6'an pê ve li Cenevreyê Swîsreyê (Îswîçreyê) dest bi jîna xwe dike.

Ji hejmara 20'an bi şûn de rojnameyê îcar bar kiriye çûye Londona Îngilistanê. Li wirê jî hejmarek derketiye. Dîsa bar kiriye û berê xwe daye jêra Îngilistanê

Folkstandê û li wirê jî 2 hejmar hatine derxistin.

Rojnameya Kurdistanê tam xwediyê jî-neke koçerî û gerok e. Li Folkstandê jî dihere Swîsreyê û heta dawiyê êdî li wê dimîne. Kurdistan hejmara xwe ya dawîn di 14'ê avrêla 1902'yan de derdixe. Tevîhev 31 hejmarên wê derdikevin. Derhênerê rojnameyê Mîqdad Mîthad Bedirxan daxuyandiye ku, wê ji 15 rojan carekê derkevin. Lê ji ber merc û derfetên wan roj û deman, daxwaza xwe nebiriye serî.

Me divê ku em hinek behsa xeta wê ya siyasî jî bikin. Rojnameyê, doza neteweyî ya kurd dikir û Kurdistan wekî eyaleteke osmanî didit. Ji pergala osmanî re jî meşrûtiyet dixwestin. Piştî ku rojname ji Qahîreyê bar kiriye çûye Ewropayê, der barê raman û dîtinên xwe de hîn bêhtir tûj û radikal bûye. Her wiha rojname bi kurdî û herfên erebî derdiket. Car caran jî cih dane tirkîya osmanî jî.

Bi mebesta ku rojname bigihîje gelê kurd, 2 hejar nûsxeyan miftî belaş şandin.

ne Kurdistanê. Wekî îro, kesên ku Kurdistan xwendine avêtine hepsan. Kurdan li gorî mercên wê demê eleqe nîşanî rojnameyê dane. Nameyên ku kurdên Şam û Edeneyê û her wiha yên Amedê, ji rojnameyê re şandine, tê de hatine weşandin.

Îsal em di 22'ê avrêlê de 99 saliya roja rojnamegeriya kurdî pîroz dikin. Ev roj bêhtir ji aliyê kurdên başûrê Kurdistanê ve mîna rojêke fermî tê pîrozkirin. Lê daxwaza me ew e ku, hemû Kurdistanî wê rojê bi hev re bi awayekî fermî pîroz bikin. Her wiha divê pîrozkirina sedsaliya rojnamegeriya kurdî jî neyê jibîrkirin. Saziya Yekîtiya Rojnamegerên Kurd gere hay ji wê rewşê hebe.

Wê çaxê jî kurdan li biyaniyê rojname derdixistin û çalakîyên bi wî rengî didomandin, îro jî wisan e. Jixwe hîmê rojnamegeriya kurdî li sirgûnê hatiye vedan. Sed sal berê jî kurd ji ber xwendina rojnameyên kurdî dihatin girtin û cezakirin, îro jî tiştek neguheriye.

Guherîna ku çêbûye ev e: Rewşenbîrên kurd li gorî mercên wê demê têkoşîneke ramanî didan, niha di gel wê têkoşîneke çekdarî, siyasî û diplomatîkê meşandin. Wê gavê kurdan jî başbaş dengên hev ne dibihîstin, lê niha dinya li ber qîrîna azadî û serxwebûna kurdan diheje.

Doza gelê kurd, doza azadiyê ye

HEMEDOK DILOVAN

Di dinyayê de gelek netewe hene. Ji wan neteweyan yek jî neteweya kurd e. Mixabin heya vê gavê jî neteweya kurd tu mafên xwe yên insanî nestandine. Lewre neteweya kurd îro bi destê dijminan hatiye parçekirin. Em di sedsala bîstan de dijîn; lê belê mîna neteweya kurd, tu neteweyên cihanê neman di bin destê dagirkeran de.

Li ser rûyê erdê her êlek, her bireke tirkên û ereban dibe xwedî dewlet. Lê îro mafên kurdan bi destê hêzên dagirker têtê înkarkirin. Mîna çi gelo? Bi qasî du milyon çepên dibin xwedî dewlet. Lê ji bo çil milyon kurd nîn e tu maf û edalet. Wê kengê mirovparêz rastiyan li ber çavên xwe bibînin, pîrsa gelê kurd li ser rojeva cihanê bidin şîrovekirin.

Gund û bajarên kurdan tîn wêrankirin. Deverên kurdan bûne çolistan. Daristanên sewalên kûvî, çiya û zinarên kurdan ji aliyê hêzên dagirker ve tîn sotin. Ev zordariya dijmin ne bes e, gundiyên bêgumeh bi darê zorê koçber dikin an jî bi zorê dikin cerdevan. Bira bi destê bira didin kuştin; ambargoyê

Dema yekî welatparêz, li hemberî zordariya dagirkeran derdikeve, ji aliyê gelek kesan ve tê tawanbarkirin. Hinek kemalist û çepgirên di doza xwe de ne rast, di hola cihanê de doza gelê kurd mîna nîjadperestiyê nîşan didin. Wekî gotineke pêşiyên kurdan: "Gîsinê di çavên xwe de nabînin, lê belê derziya di çavên min de dibînin."

datînin ser gund û bajaran. Gund ji gundiyan re kirine zîndaneke servekirî.


Metelok heye ku ew rewşa insanên kurd a niha, gelekî baş tîne zimên. Yekî gundî li daristanê kerê xwe ditewilîne. Gurekî boz tê kerê gundî dixwe. Heyî û neyîna gundî bi xwe ew ker bûye. Gundî dikeve pey gurê boz, lê nagihe gurê boz. Di rê de pêşberî gurê reş tê, gundî ji xwe re dibêje: "Weleh ez dizanim ne te kerê min xwariye, lê belê tu ji birayê gurê boz î." Bivirekî li serê gurê reş dixwe û wî dîkujê. Dagirker jî, mîna yê gundî, mirovên bêgumeh zindî zindî dişewitînin.

Dema yekî welatparêz, li hemberî zordariya dagirkeran derdikeve, ji aliyê gelek hêzan ve tê tawanbarkirin. Hinek kemalist û çepên di doza xwe de ne rast, di hola cihanê de doza gelê kurd

mîna nîjadperestiyê nîşan didin. Wekî gotineke pêşiyên kurdan: "Gîsinê di çavên xwe de nabînin, lê belê derziya di çavên min de dibînin."

Ez dipirsim li ku dera dinyayê, li welatê xwe xwedîderketin û ji zimanê dîroka xwe hezkin bûye nîjadperestî? Gelo, kengê yekî kurd mîna mezinên tirkên li ser çiyayên tirkên nivîsandine: "Kurdek bedelê cihanê ye", "Xwezî bi kesê ku ji xwe re bibêje kurd"? Gelo çima ronakbîr û rewşenbîrên tirkên cihanê li hemberî van nîjadperestîyan dengê xwe hîlnadin. Bila hemû cihan bizane ku doza gelê kurd ne tu welat, ne tu axa neteweyan vegirtine.

Têkoşîna gelê kurd li hemberî zordariyê, xwerizgarkirina ji bindestiyê û bêhtir serxwebûn û aştîya bi dil û can e, ji hemû neteweyên cihanê re.



CIVÎNA 95'emîn ya Yekîtiya Navparlementoyî, heftiya çuyî li Stenbolê çêbû. Di danişîna civînê ya 16'ê avrêlê de ji heyeta Norwecê Anita Apeltun Saele, ji dewleta tirk xwest ku mafên hindikahiyan û mafên mirovan binase.

Saeleyê sozên ku Tirkîyeyê di warê mafê perwerdehî û weşanê de dabûn, bi bîr xist û diyar kir ku hê tu gav nehatine avêtin.

Parlementera norwecî da zanîn ku mafên mirovan bi taybetî tê bînpêkirin û daxuyand ku meseleya kurdî bi çekan çareser nabe. Anita Apeltun Saele berdana Leyla Zana û parlementerên DEP'ê jî xwest.



WALIYÊ Amedê yê berê Doğan Hatipoğlu da zanîn ku wan di sala 1995'an de ji bo vegerandina koçberan projeyek pêşkêşî Tansu Çillerê kiriye, lê ew proje li ser kaxizê maye.

Hatipoğlu diyar kir ku avakirina gundan, ji valakirinê zehmetir e. Li gorî hesabên ku wan kiriye, ji bo vegerîna her malbatê milyarek pere divê.

Waliyê Amedê yê berê bi bîr dixê ku nifûsa Amedê ji 381 hezarî gihîştîye milyonekî. Li gorî gotina Hatipoğlu, bi tenê li derdora Amedê 67 gund û 160 mezra hatine valakirin. Ew dibêje: "Ji bo çareserîya probleman samîniyet pêwîst e."

NÛÇE

Şerê li sêgoşeyê ji şerxwazan re serfirazî neanî

Artêşa tirk di destpêka meha avrêlê de piştî amadekariyên dirêj, bi mebesta tunekirina hêzên gerîla, li sêgoşeya Licê, Pasûr û Hênê dest bi operasyoneke berfireh kir. Lê, menzereya ku piştî şer derket holê têkçûna wê destnîşan dike. Bi vê operasyonê xebata xerakirina agirbestê û qutkirina dengên aştîxwaz jî bi avê de çû.

Ji ber agirbesta yekalî, demeke dirêj nûçeyên şer bi berfirehî di çapemeniya tirk de cih nedigirtin. Lê operasyona sêgoşeya Licê, Pasûr û Hênê di hemû rojname û televîzyonên dewleta tirk de bi berfirehî cih girt.

Her wekî dihat zanîn, çapemeniya tirk bi şeweyeke ne rast cih da operasyonê. Li gorî daxuyaniyên fermî ku di medyaya tirk de cih girtin, hêzên tirk di 5'ê avrêlê de operasyonek li dar xistine û avêtine ser bargeheke PKK'ê ya li sêgoşeya Licê, Pasûr û Hênê. Li gorî van daxuyaniyan di şer de bi sedan PKK'yî û 27 jî leşker hatine kuştin. Şeweya peyamên medyaya tirk jî bilî zêdekirina hejmara zaiyatên gerîla û çîrokên lehengiya "mehmetçik" zêde neguherî.

Lê hin kesan bal kişand ser zêdebûna zaiyatên artêşa tirk. Li hemberî vê yekê rayedarên tirk gotin: "Kîjan artêş karê bi zaiyateke hindiktir operasyoneke bi vî rengî pêk bîne, bila were." Serleşkerêkî bîyî ku navê xwe bide, hin agahî didan Yavuz Donat û wî jî roja 10'ê avrêlê di quncikê xwe yê di Milli-yetê de ew diweşandin. Serleşkerê nediyar rewşa artêşa xwe dida ber rewşa artêşa amerîkî ya li Vîetnamê û artêşa rûs li Afganîstanê.

Wî digot: "Tevî ku li Vîetnamê beramberî 10 leşkerên amerîkî gerilayekî vîetnamî, li Afganîstanê jî beramberî 11 leşkerên rûs, mucahîdek hatîye kuştin. Rewşa me berevajî vê yekê ye, beramberî leşkerêkî, 7 PKK'yî tên kuştin." Yanê rayedarê artêşa tirk, artêşa xwe jî artêşên du hêzên super jîrtir nîşan dida. Dîsa heman kesê nediyar, derbarê operasyonên hewayî yên bi ser


Başûr de digot: "Balafirên hêzên herî pêşkeftî jî ancax karin ji sedî 30 encamê ji van operasyonan bistînin, lê balafirên me ji sedî 90 li hedefên xwe didin."

Li aliyê din, dema hin nivîskarên bi bîr dixistin ku di Şerê Kendavê de artêşa amerîkî bi tenê 50 zaiyat dane, Emin Çölaşan digot: "Îmkânên artêşa amerîkî di destê tu artêşên din de nîn in."

Şayanî gotinê ye ku nivîsên quncikên rojnameyên tirk, ji nûçeyan nermtir bûn. Hin nivîskarên wekî Yavuz Gökmen, Zülfü Livaneli, Ahmet Altan, Melih Aşık û hwd. aştîxwaziya xwe diyar kirin û xwestin ku bes xwîn birije. Lewre jî Emin Çölaşan gelekî zivêr bû û roja 11'ê avrêlê di quncikê xwe yê rojnameya Hürriyetê de çi hat ber devê wî, ji wan kesan re got.

Piştî ku hêdî hêdî rastî eşkere bû, çapemeniyê jî nişka ve bûyer jî manşetê xist û bi hincetên ku nedihatîn bîra serleşkeriyê tirk, çîrokên serkeftina artêşê domandin. Hêzên tirk qala kuştina bi sedan gerîla dikir, lê bi tenê cendekê yek kesî nîşanî rojnamegerên ku birin herêmê dan. Herhal jî ber vê yekê bû ku, çapemeniya navneteweyî zêde guhê xwe neda daxuyaniyên resmî, qet nebe berevajî helwesta xwe ya berê, cih da daxuyaniyên gerîla jî.

Divê bê gotin ku bi vê bûyerê girîngiya çapemeniya alternatîf, bi taybetî jî MED-TV'yê xwe da der. Televîzyona kurdî demeke kin de agahiyên girîng jî çavkaniyên xwecihî standin û ew pêşkêşî raya giştî kirin. Çavkaniyên herêmî didan zanîn ku zaiyatên artêşê li dora 70 kesî ye û zêdetirî 20 gundî jî hatine kuştin. Her wiha piştî demekê jî



Ji fermandarên Biryargeha Giştî ya ARGK'ê Şemdin Sakik (Şemo)

çavkaniyên gerîla li ser bûyerê hin daxuyanî dan. Li gorî van daxuyaniyan di şer de zêdetirî sed kes ji artêşa tirk û 8 gerîla hatine kuştin.

Divê bê gotin ku, tevî êrîşeke bi vî rengî hem ERNK'ya Ewropayê û hem jî, ji fermandarên Biryargeha Giştî ya ARGK'ê Şemdin Sakik, ku roja 11'ê avrêlê bi telefonê daxuyaniyek da, diyar kir ku wê agirbest bidome û hêzên gerîla berevaniya aktif pêk tînin. Şemdin Sakik, da zanîn ku hêzên tirk nikarin bi şer bigihîjin tu encamê. Fermandarê ARGK'ê Sakik diyar kir ku ew hî-nî axivîna bi zimanê ku, artêşa tirk jê fêhm dike, bûne û êdî artêşa tirk nikare bi şer tişteki hel bike. Her wiha Sakik got ku dewleta tirk ne bi daxwaza xwe şer didomîne, lê hêzên împeryalist vê yekê dixwazin.

Li aliyê din Koordînatore Eyaleta Amedê Cemal roja 17'ê avrêlê daxuyand ku mesele ne bi şeweya ku rayedarên tirk dibêjin qewimiye. Li gorî vê daxuyaniyê, operasyonê di 1'ê avrêlê de bi êrîşên hewayî dest pê kiriye û heta 4'ê avrêlê herêm hatiye bombekirin. Tê gotin ku piştî 5'ê avrêlê, hêzên tirk ji bakurê Licê ketine herêmê, lê piştî ku 5 leşker di kemîneke gerîla de hatine kuştin, hêzên tirk vekişîne. Dîsa li gorî daxuyaniyê êvara 5'ê avrêlê, hêzên tirk dest bi êrîşeke berfireh kirine, di 6'ê

mehê de jî li herêmeke berfireh şer dest pê kiriye û heta êvarî domandiye. Daxuyanî diyar dike ku, wê şevê hêzên gerîla ber bi bakur ve vekişîne û serê sibeha 8'ê avrêlê gerîla êrîş birine ser yekîneyeke artêşa tirk, li dora 50 leşkerî kuştine. Bi awayê ku daxuyanî dide zanîn, gerîla li wir dest danîne ser kunyê û çekên 35 leşkerî.

Di daxuyaniya Koordînatore Amedê de tê eşkerekirin ku 300 gerilayî li hemberî 30 hezar leşkerî şer kiriye. Dîsa tê gotin ku zaiyatên artêşa tirk li dora 150 kesî ye û kunyeya 50 leşkerî di destê wan de ye. Daxuyanî eşkere dike ku şerleşkeriya tirk ji ber ku kunyeyên leşkeran ketine destê gerîla, mecbûr maye hin zaiyatên xwe diyar bike. Li gorî Koordînatore Eyaleta Amedê, zaiyatên artêşa tirk ne normal e, ji ber ku artêşa tirk piştî amadekariyeke dirêj, ev êrîş pêk anîye û gerîla di berevaniyê de bûye. Koordînatore Amedê armanca operasyonê wekî tunekirina hêzên gerîla diyar kir û daxuyand ku artêş di pêkanîna armanca xwe de bi ser neketiye, berevajî li hemberî gerîla têk çûye. Ji daxuyaniya Koordînatore Eyaleta Amedê derdikeve holê ku artêşa tirk piştî qedîna şerê germ, operasyon eşkere kiriye, ji ber ku piştî 10'ê mehê zêde şer çênebûne.

SAMÎ BERBANG

Eşq li Kurdistanê

dest pê dike (1)

GÜRDAL AKSOY


*Ji welatê min ê dilçiyayî
Ku çivikên hesinî lê xwîn vedirîşin,
Ji hemû zarokên serhildêran re
Ku di qûntarên bêserûbin de diwelidîn
Di şewatên bajaran de mezin dibin û
Eşq ji nikarin wan kevn bikin
Û
Ji bo biranîna bavê min Hüseyn Aksoy
Ku di demeke nêzik de min ew winda kir...*

Ji aliyê tarîxî ve eşq, cara pêşîn li ku û kengê derketê holê? Civaka ku cara yekemîn eşq jiyaye, kîjan bû? Û wek encam jî, şertên dîrokî ku eşq welidandin, çi bûn?

Lêkolîner, ji ber çi ye nizamim, xwe nêzikî fareziyeke şaş dikin; wekî ku eşq di Dema Navîn de welidîbe. Heta bi rihetî dibêjin ku eşq “îcadeke” Dema Navîn e(1). Her wiha Engels jî dibêje, ne mimkun e mirov behsa eşqê bike wekî ku beriya Dema Navîn hebe. Ji aliyê tarîxî ve eşq cara pêşîn, di Dema Navîn de tê dîtin û ev awayê yekemîn ê eşqê jî eşqa şovalyetiyê ye(2). Lê belê Bertrand Russell di berhema xwe ya bi navê “Evlilik ve Ahlak” (Zewac û Ehlaq) de dide nîşan ku; gotineke bi rengê “eşqa romantîk beriya Dema Navîn nedihat zanîn”, ne rast e, lê ew tenê li Dema Navîn wisa bûye ku, ji aliyê her kesî ve hatiye zanîn(3). Bi kurtasî, tu îtiraza me jî nîn e ku eşqa şovalyetiyê, di Ewropaya Dema Navîn de yanê di wî cih û wextî de ku şovalyetî lê hebû, derketiye holê. Lê bi rastî jî, di vî warî de şik û gumanên me yên cidî hene. Her wiha delîlên ku, van gumanên me tesdîq dikin jî di dest me de hene.

Berî her tiştî, eşq ji ber ku çeşneke fetîşîzma mulkiyetê ye, dema mirov wê, li wê cografyaya ku sîstema civakî ya mulkiyeta taybet derketiye holê, bigere rastir e. Emê jî di pey vê lêgerînê de hin notan bistînin û binê hin rastiyan careke din xêz bikin. Dema em vê bikin jî, emê gotegotekê, gotegota (mîtos) Adem û Hawa ji hev vekiin û vê mijarê li ser bingehekê deynin (bidin rûniştandin). Lewre di tahlîla dawîn de, avaniya (kurgu) bingeîn a vê gotegotê, ji me re, mirovatiya ku ji civaka komunal derbasî civaka cîniyetî, bi awayekî din, ji barbariyê derbasî medeniyetê bûne, tîne zimên(4).

Mirov dikare vê bi awayekî din jî îzah bike; ji mulkiyeta komunal derbasbûna mulkiyeta taybet. Jean Jacques Rousseau, di berhema xwe ya bi na-



Di bûyera qewirandina Adem û Hawa ji bihuştê (cennet) de jî, Xwedê mîna ku xwediye bihuştê be, derdora wê derê digire û dibêje: “Ev der ya min e”.

Ev bûyer, derdixê holê ku parçeyek erd, cara yekemîn wê demê dibe mijara mulkiyetê

vê “Însanlar Arasındaki Eşitsizliğin Kaynağı” (Di navbera insanan de jêderka newekheviyê) de, vê rastiye bi vî awayî îfade dike: “Mirovê pêşîn ku li derdora parçeyek erd çeper kişandiye û gotiye ‘Ev, aîdî min e’ û insanan saf bi xwe dane bawerkirin, sazkarê rastîna civaka medenî ye. Ew zîlamê ku singên sînoran derxista û biavêta an jî ew cîniyetê çeperê dagirtana, dî re jî bang li hemcînsên xwe bikira û bigota: ‘Guh nedin vî sextekarî! Dema hûn ji bîr bikin ku, fêkî aîdî her kesî ne û ax ne malê tu kesî ye, hûnê mehf bibin’, mirova-

hî ji gelek sîc, cîniyet, xizani û bûyerên xerab biparasta.”(5).

Wisa tê fêmkirin ku Rousseau jî, medeniyetê bi mulkiyeta taybet ve girêdide û bi awayekî nuxamtî (veşartî) dîsa ji wê gotegotê îstifade dike. Lê, Rousseau newêribûye ku êşkere binivîse, çûnkî li vê derê, mîna Xwedê, destpêkerê destpêkirina mulkiyetê ye, dike nûnerê sembolîk ê koletiyê; Şeytên jî mîna karekterekî wisa ku li dijî mulkiyetê derketiye, dike nûnerê sembolîk ê azadbûyînê. Dema bi vî rengî nivîsiye; “Fêkî aîdî her kesî ne û ax jî ne ya tu

kesî ye”, ez bawer dikim, li têkoşîna Şeytên û Xwedê fikiriye, ku di gotegota Adem û Hawa de cih digire. Di bûyera qewirandina Adem û Hawa ji bihuştê (cennet) de jî, Xwedê mîna ku xwediye bihuştê be, derdora wê derê digire û dibêje: “Ev der ya min e”. Ev bûyer, derdixê holê ku parçeyek erd, cara yekemîn, wê demê dibe mijara mulkiyetê. Bi vî awayî, Xwedê dema ji Adem û Hawa re dibêje: “Li bihuştê, ji her tiştî dikarin bixwin û vexwin, lê hûn ji dara sêvê nikarin bixwin”, bihevrebûna milk û qedexebûnê jî destnîşan dike. Ev qedexe, divê wekî qedexekirina awayê jiyana berhevker (û nêçîrvan) bê dîtin. Ji ber ku, piştî ku Adem û Hawa tiştên qedexe xistin bin piyan û ji wê derê hatin qewirandin, Xwedê ew şandin ser rûyê dinyayê û cara yekemîn jî li dinyayê wan dest bi karê çandiniyê kir, şîroveya bi vî rengî mafdar derdixê.

Ji ber vê yekê, ev gotegot (mîtos) ji aliyekî din ve, ji dema berhevkerîna derbasbûna dema çandiniyê, ji nêçîrvaniyê jî derbasbûna dema kedîkirina heywanan, tîne zimên. Li vê derê Şeytan, versiyona pederşahî (patrîarkal) ya Makxweda ku di dinyaya antîk de bi giştî bi marê sembolîzekirin e. Ji vî alî ve, fitkariya mar ango Makxwedayê, ji bo bînpêkirina qedexeyan a van insanan jî xwe bêhaydar, mîna nîşana li berxwedana dawîn a maderşahiye (matriarkal) ye. Ez zen dikim ku bihuşt, sembolîzekirina merhaleya jorîn a barbartiyê ye, belkî merhaleya hortîkultûrist e, yanê merhaleya çandiniya bexçeyê ye (Lat. hortus: bexçe / cultura: çandîn hwd.), lê mirovan hê dev ji berhevkeriyê jî bernedane. Enteresan e, di gelek zimanan de peyvên ku di maneya bihuşt de ne, bi taybetî tê maneya bexçe. Mîna, peyva di erebî de ‘cennet’ û di farisî de ‘firdevs’ û di zimanê rojavayîyan de peyva ‘eden’ ji aliyê koka xwe ve tîne heman wateyê. Jixwe insanan gelek caran di cihê peyva ‘cennet’ de biwêja ‘bexçeyê cennetê’ tercîh dikin.

Li vê derê me gotibû ku bexçe bi hev re du merhaleyan îfade dike. Ya yekemîn; ji ber ku, ji bo berhevkeriyê mekaneke musaît e, merhaleya berhevkeriyê, ya din jî, ji ber ku di eynî demê de ji çandina bexçeyê re jî musaît e; merhaleya hortîkultûrist îfade dike. Di vê qonaxa civakî de erd, ji ber ku ji aliyê jinan ve tê tevrkirin, pêşengên vî merhaleyê ku jê re ‘çandiniya kevnare’ tê gotin, dîsa jin in. Li gorî ku Briffault

dibêje, destpêka kirina karên çandiniyê ji aliyê mêran ve, ancax, tê serdema conegayên kedîbûyî, ku di karê gîsînkirî-nê de hatine bikaranîn(6).

Bi rastî jî, cotkirina erd bi gîsin, ji aliyekî ve îşareta lipaşmayîna çandiniya bexçe ye, ji aliyê din ve jî, êdî nîşan dide ku ji aliyê mêran ve karên çandiniyê tene kirin. Her wiha, li gorî ku tê dîtin, di belgeyên herî kevn a Sumer û Misiran de kesên ku cot dikin mên in(7). Ev rastî jî, nîşan dide ku ev gotegot ji Mezopotamyayê derketiye. Wekî vê gotegotê, karê nîrxistina stûyê ga û pê cotkirin, cara yekemîn li Mezopotamyayê pêk hatiye. Bi giştî, hebûna heywanên stûkurt jî bi vê yekê ve tene girêdan. Heta ji ber ku, heywanên barkêş zêde tune bûn, di vê cografyayê de ji bo cotkaran metoda kirêkirina ga jî mimkun bû(8). Berê jî me nivîsandibû ku, Adem pêşiyê (kalê) sembolîk ê hînd-ewrûpayîyan e, ku wan li ser rûyê erdê cara yekemîn dest bi çandiniyê kirine(9). Lê li vê derê bi taybetî divê were gotin ku, cihgirtina vî hînd-ewrûpayiyê sembolîk û mîfîk, ne di gotegota hînd-ewrûpayîyan de, lê di ya semîfîk de, ne mimkun e ku mirov şaş û metel nehêle.

Eşq, cara yekemîn bi milkzanîna bedenê derketiye holê û şeweyeke hezkiyeke nûjen e. Ew, ancax di civakekê de ku însan gihîştine radeya milkzanîne ya ku tiştan wekî xweşik-nexweşik ji hev veqetîne, derketiye holê. Ji ber van tevan, em li vê derê dixwazin li rastiye-

S

êv û dara sêvê, li vê derê peywendiya cinsî û tîkiliya cinsan îfade dike. Lewre, Adem û Hawa dema ji fêkiya vê darê xwarine, organên xwe yên cinsî tazî dîtine û xwe nuxamtine. Yanê, bi awayekî din, bi cinsiyeta xwe hesiyane. Jixwe, sêv, di ferhengên mîtolojiyê de, tê maneya fallîk (phallic) jî.

ke dîrokî bikolin û derxin holê ka eşq, cara yekemîn li cografyaya kurdan derketiye an na. Dema li vê bikolin jî, ey-nî mîna Rousseau, emê vê gotegotê li ber çav bigirin.

Vêga, em di vê gotegotê de, maneya dara sêvê bigihîjin. Sêv û dara sêvê, li vê derê peywendiya cinsî û tîkiliya cinsan îfade dike. Lewre, Adem û Hawa dema ji fêkiya vê darê xwarine, organên xwe yên cinsî tazî dîtine û xwe nuxamtine. Yanê, bi awayekî din, bi cinsiyeta xwe hesiyane. Jixwe, sêv, di ferhengên mîtolojiyê de, tê maneya fallîk (phallic) jî û cinsiyetiye, erotîzmê û ji teva jî zêdetir eşqê bi bîr dixê. Vê maneya sêvê ya sembolîk, di dema nêzik de, di civaka kurdan de jî mirov rast lê tê. Her wiha, li hin herêmên me, di maneya dawetkirina zewacê de, tê gotin ku sêv ji malan re dihat şandin. Li gorî ku min bihîstiye tiştêkî din jî heye, li hin cihan bi taybetî ji xortan re pêşkêşkirina sêvan ji aliyê keçên xame ve, hatiye maneya ku ew aşîqê wî xortî bûye û jê hez dike.

Ji girêdana sêvê bi cinsiyetiye ve, hinek jî dibê ku vê baweriya arkaîk jê re xizmet kiribe. Wekî ku tê zanîn, di civakên barbar û hov de, rastiya biyolojîk a bavîtiyê nedihat zanîn, yanê di çebûna zarokan de rola mêran nedihat zanîn. Di cihê vê de, wisa dihat bawer kirin ku jin bi taybetî bi xwarina giyayekî an jî fêkiyekî bi hemle dimînin(10). Briffault, ji baweriya xwecihiyên Mançuyan behs dike ku, jin bi xwarina fêkiyekî sor bi hemle dimînin(11). Di mîtolojiyê de li vê motifê mirov gelek cara rast tê. Her wekî di hîftîtiyan de jî, Attis, diya wî piştî ku behîv xwariye an jî li gorî baweriyeke din hinar xwariye, ketiye rehîma diya xwe. Hera, ji Hephaistos re dema çiçekek xwariye, ji Hebe yê re jî bi xwarina zelateyê bi hemle maye(12). Zerdûşt jî, dema diya wî giyayê homaya bişîr xwariye hatiye dinê(13).

Bi qasî ku em ji Malinowski hîn dibin, di xwecihiyên Trobriand de jî, ev kêmagahî heye. Ew jî wisa bawer dikin ku jin bi alîkariya ruhan bi hemle dimînin. Heta Malinowski, dema ji rola

mêran a di hemlemayîna jinan de behs dike, xwecihî zêde baweriya xwe pê nayinin(14).

ÇAVKANÎ

1. M. Ali Kılıçbay, *Bir Ortaçağ İcadı: Aşk! Cumhuriyet Dergi*, hej. 457, 25. Berfanbar 1994, rpl. 2, 3.

2. Engels, Ailenin, Özel Mülkiyetin ve Devletin Kökeni, wergera tirkî: Kenan Somer, (Enqere, 1979), rpl. 93, 101 û 102.

3. Bertrand Russell, Evlilik ve Ahlak, wergera tirkî: Ender Gürol, (Stenbol 1977), rpl. 52.

4. G. Aksoy, Hieros Gamos. Tanrı Baba Üzerine Notlar, (Stenbol, 1993), rpl. 155, 71.

5. J.J. Rousseau, İnsanlar Arasındaki Eşitsizliğin Kaynağı, wergera tirkî: Rasih Nuri İleri, (Stenbol, 1990), rpl. 135.

6. R. Briffault, Analar, wergera tirkî: Şemsa Yeğin, (Stenbol, 1990), rpl. 202.

7. G. Childe, Tarihte Neler Oldu, wergera tirkî: M. Tunçay- A. Şenel, (Stenbol, 1990), rpl. 61.

8. K. Ritter, Dünya Ziraat Tarihi, wergera tirkî: K. Köylü, (Enqere, 1962), rpl. 12.

9. Aksoy, (Berhema nav bihurî (b.n.b.)).

10. Evelyn Reed, Kadının Evrimi, Anaerkil Klandan Ataerkil Aileye, wergera tirkî: Şemsa Yeğin, (Stenbol, 1983), C.II, rpl. 96.

11. Ibid, Idem.

12. Ibid, Idem

13. Ibid, Idem


14. B. Malinowski, Kuzeybatı Malenezya'da Vahşilerin Cinsel Yaşamı, wergera tirkî: Saadet Özkal, (Stenbol, 1992), rpl. 149, 151.

Wê bi dome

Werger: NUR-HAYAT

Di navgînên ragihandinê de tevliheviya zimên

MAZHAR GÜNBAT



Rojnamegerî warekî girîng ê ragihandin, perwerdehî û guhertina fikrên raya giştî ye. Wekî her warî ev war jî xwedî taybetiyên xweser e. Di armanc û hedefên xwe de bi gelek war û dezgehên din ên civakî, siyasî, çandî û hwd. re di eynî riyê de be jî, ji aliyê materyal, stîl, usûl, ziman, mijar, form, pisporî û xemla xwe ve xwedî hin taybetiyên xweser û cihêreng e.

Her wiha, her şax û beşên rojnamegeriyê, di nava xwe de, bi hin aliyên xwe yên teknîk, bi şewê û terzên xwe, ji hev vediqetin.

Rojnamegerî ku îro yek ji warên herî bibandor ên li ser civakê ye, di pêkanîna rola xwe de bi giranî ji zimên îstifade dike. Ew li gorî her mijar û babetê zimanekî hev-girtî bi kar tîne, da ku rola xwe bîne cih û bi ser bikeve. Fergên bingeşîn hene di navbera awayê bikaranîna zimanê her beşeke rojnamegeriyê de. Dîsa ji bo her yek ji van beşan hin peyv, biwêj û tîgehên taybet hene. Dema biwêj, usûl, teknîk û forma zimanê beşekê ji bo babeteke din bêne bikaranîn, sergêjî û tevlihevî jî derdikevin holê û ihtîmal heye di şûna

fevdeyê de zîrarê bide girseya ku lê tê xîtapkirin.

Gelo di rojnamegerî û dezgehên ragihandinê yên kurdî de rewşa zimên çawa ye û ew çiqas li cih û bitesîr tê bikaranîn, zimanê şaxekê an jî yê beşekê bi yekî din re tê tevlihevkirin an na? Eger tevlihevî hebe, ji ber tengbûn û lipaşmayîna zimanê kurdî ye an jî ji nezanîna bikaranîna wî ya meslekî ye?

Rojnamegeriya kurdî her çiqas berî 98 salan dest pê kiribe jî, ji ber sebebîne diyar, heta îro jî negihaye sewiya sazîbûneke rûniştî û ji aliyê zimanê meslekî ve hê jî di pêngava destpêkê de ye. Her çiqas di vî warî de kurdên Başûr ji berê ve hin xebatên domdar kiribin jî, ji aliyê terz, usûl, û biwêjan ve zimanê gelek beş û babetan tevlihev kirine û mirov bi hêsanî nikare bibêje ku wan jî zimanekî rojnamegeriyê durist kiriye.

Ji bo Rojhilat jî eynî tişt dikarin bîn gotin. Li Bakurê Kurdistanê çênebûna zimanê rojnamegeriyê li aliyekî ji ber çewt-bikaranîn û tevlihevkirina zimanê gelek waran, zimanê durist ê ku gel jî bi kar tîne ji hin aliyan ve ketiye nav xetereyê.

Hem di rojname, kovar, bulten, pirtûk û hemû weşanên nivîskî de, hem jî di televizyon, radyo, fîlm, şano, sêminar, panel û her cure çalakîyên dezgehên ragihandin û rewşenbîriyê de zimanê warekî ji ber ku bi girîngî û berpirsiyarî li ser nayê rawestîn, an jî ji tecrûbeyên gelê din nayê îstifadekirin, bi yên war û babetîne din re tê tevlihevkirin. Bi milyonan kurdên ku bi baldarî van nivîs û dangan dixwînin, lê guhdar

dikin, wan ji bo xwe dezgehên fêkirinê dibînin û hin caran zimanê wan ê rast, bi tesîra çewtiyên ku em dikin, xera dibê.


Bêyî ku ji bîra min here, ez dixwazim diyar bikim ku li gorî nêrîn û baweriya min, ev dezgeh fevdeyên pir mezin didin gel, ne tenê ji hêla siyasî û çandî ve, her wiha ji hêla fêkirina belavkirin û bicihkirina zimên ve jî hebûna van dezgehên mîna av û hewayê pêwîst e ji bo perwerdebûnê. Wekî din, ez baş dizanim di nav kîjan rewş û şertên dijwar û di nav çî lezûbeza şoreşê de ev kar tene meşandin. Bes, sebeb çî dibin bila bibin ev nayê wê maneyê ku pêwîst nîn e em li ser kêmasiyên xwe bisekinin. Ji bo ku em xwe di vî warî de bigihînin pîvanên rojnamegeriya hemdem, divê em rê li ber bigirin ku av û hewayê me bi çewtî û tevliheviyan zêde şilo û xerab bibin. Ji ber vê yekê pêwîst e em yekê yek li ser van dezgehên û beşên wan bisekinin, bi mînakîne berbiçav bidin xuyakirin ku di dezgehîne me de çawa nûçe dibin şîrove, şîrove dibin çîrok, çîrok dibin helbest, helbest dibin nûçe, slogan dibin helbest, çîrokên gelêrî dibin roman, gotînen ku mezin jê fêm nakin ji zarokan re tene vegotin. Dîsa emê binêrin ka li gorî kîjan pîvanan spîker mîna akademîsyenan dipeyivin, akademîsyen bi devokên gundê xwe diştexilin, nivîskarê quncikan di şûna rexneyan de dijmînan dikin..

Di nivîseke din de bêyî ku ez navê şexs û saziyan bidim ezê hewl bidim ku ji van tevlihevî û çewtiyan hin mînakên bidim û ji bo duristkirina wan jî pêşniyarên xwe bînim zimên.

DÎE'yê sûcê dewletê

Warê kurdan ji ber şerê qirêjî ketiye rewşeke pir xerab. Karîna kirin û dahata gel, zehf kêr bûye. Aboriya herêmê ku li ser çandinî û xwedîkirina sewalan bû, têk çûye. Îro rewşa aborî yên welatên Afrîkayê ku li wan xela heye, ji ya kurdan baştir e.

tescîl kir



Kurdistan her tim wekî qada şer hatiye bikaranîn. Ji roja ku şûrkêşên tirkên gava xwe avêtine nava Kurdistanê, heta niha Kurdistan her tim bûye warê şer û pevçûnan. Dema wan bi xwe şer nekirine, îcar eşîrên kurd berî hev dane.

Şerê 1071'î wekî tê zanîn li Melazgîra Mûşê di navbera selçûqî û hêzên bîzansî de qewimî. Dîsa di dema osmanîyan de, qada şerê di navbera tirk û farîsan, tirk û rûsan de Kurdistan bû. Zanyarên ku li ser Kurdistanê lêkolînê dikin, didin zanîn ku ev yek bûye sedemê têkçûna aboriya Kurdistanê.

Tevî vê yekê, hêzên dagirker her tim dest danîne ser dewlemendiyên gelê

Rapora DÎE'yê derdixe holê ku dewlet pereyê herî zehf li meaşên karmend û ceşşan xerc dike û vê yekê wekî ku li gelê kurd xerc kiribe, dide nîşan. Pereyên ku dewlet li personelê xwe yên li herêma ku jê re dibêjin "Rojhilat" xerc dikin ji sedî 26.3'yê hemû hasilata herêmê digire. Li herêma ku jê re dibêjin "Başûrê Rojhilat" ev rêje dibe %12.5.

kurd jî. Di dema feodalî de gelê kurd wekî kana bac û leşkeran dîtine û hemû nîrx û hêjahiyên gelê kurd xesp kirine.

Heta li gorî gerokê navdar ê tirk Evliya Çelebî, padîşahê tirk di sedsala 17'an de tevî hemû malê wî, dest danîye ser pirtûkên Mîrê Bedlîsê Abdal

Xan jî. Niha jî dewlemendiyên sererd û binerdî talan dikin û bi çavê karkerên erzan li kurdan dinêrin. Di ser de jî van rojan hin berdevkên dewleta tirk bîyî bînin bîra xwe ku piraniya elektrîka wan ji bendavên Kurdistanê tê, dibêjin: "Gelê Rojhilat elektrîkê belaş xerc dike û ev bîdadi ye."

Îcar em qaşo vê bîdadiyê deynin aliyekî, raporeke ku Enstîtuya İstatistikê ya Dewletê (DİE) amade kiriye, bîdadiya rasteqîn li ber çavan radixe. Ev rapor nîşan dide ku polîtîkayên dewletê yên kedxwar û şerê ku ew li bakurê welêt dimeşîne, ew der xistiye çî rewşê.

Ev rapor, li ser salên di navbera 1987 û 1994'an radiweste. Li gorî raporê, bakurê Kurdistanê bi giştî (rojhilat û başûrê rojhilatê Anadolê) di Hilberîn Hundiirîn a Nexwerû de di sala 1987'an xwediyê pareke %9.3'yî bûye, lê di 1994'an de ev daketiye %9.2'yan. Li aliyê din para herêma Marmarayê bi serê xwe %35.6 e. Rapor derdixe holê ku dewlet pereyê herî zehf li meaşên karmend û ceşşan xerc dike û vê yekê wekî ku li gelê kurd xerc dike, nîşan dide. Wek mînak pereyên ku dewlet li personelê xwe xerc dike, li herêma ku

jê re dibêjin "Rojhilat" ji sedî 26.3'yê hemû hasilata herêmê digire. Li herêma ku jê re dibêjin "Başûrê Rojhilat" ev rêje dibe %12.5. Li aliyê din, di nava %3.8'ê hasilata herêma "Rojhilat" de para çandiniyê û xwedîkirina sewalan %23, para sanayiyê jî %15.9 e.

Xuya ye ku di salên piştî 1994'an de rewş xerabtir bûye, ji ber ku bi hezaran gundên kurdan hatine wêrankirin, berê gundiyan an li erdê maye, an jî hatiye şewitandin. Her wiha qedexeya li ser derketina zozanan û şewitandina mîrgan, derbeyeke mezin li kesên ku sewalan xwedî dikin, xistiye.

Rapora DÎE'yê wekî bajarê herî xizan, Agiriyê nîşan dide. Deh bajarên xizan jî wiha tên rêzkirin: Agirî, Çewlik, Bedlîs, Culemerg, Qers, Mûş, Bayburt, Îdir, Ardahan û Wan. Dewlemendiya bajarên Tirkiyeyê gihîştîye 11 qatî bajarên Kurdisitanê. Yanê pereyê ku bi dest mirovekî dikeve, li Agiriyê 514 dolar e, li İzmirê 5924 dolar e.


Divê bê gotin ku di navbera van salan de pêşketin di aboriya Tirkiyeyê de jî çênebûye. Wekî mînak hilberîn herêma Ege û Marmarayê di sala 1987'an de %51.9 bûye, ev rêje di sala 1994'an de bûye %52.8.

Her wiha bajarê herî dewlemend İzmir ancax digihîje radeya Slovenyayê û mirovên Stenbolê jî bi qasî Şiliyê dewlemend in. Dîsa di navbera çînen serdest û bindest ên Tirkiyeyê de jî cudatiyeke berbiçav xuya ye. Her wisa ku rewşa hemû mirovên kurd ne wekî hev e.

S. TAN



Ji ber şerê ku li welatê kurdan tê domandin rewşa aborî ya gelê kurd ji ya welatên ku li xela heye xerabtir e.



● 22.4.1898

Mîqdad Mîthad Bedîrxan cara yekemîn li paytextê Misrê Qahîreyê rojnameyeke kurdî bi navê "Kurdistan" derxist. Piştî vê rojnameyê di sala 1908'an de li Stenbolê ji aliyê Sureyya Bedîrxan ve rojnameyek bi navê "Kurdistan" hate weşandin.

Di sala 1919'yan de jî, Muhemed Mîhrî Hîlav li Stenbolê rojnameyeke bi navê "Kurdistan" weşand.

Roja 22'yê avrêlê ji ber ku rojnameyeke bi kurdî hatiye weşandin, ew roj wekî rojnamegeriya kurdî hatiye qebûlkirin û tê pîrozkirin.

● 24.4.1915

Qetlîama Ermenîyan, li Kurdistanê ji aliyê dewleta Osmanî ve hate kirin. Bi sed hezar ermen ji Kurdistanê dane koçberkirin, bi hezaran ermen di riyên koçberiyê de qir bûn.

● 24.4.1986

Santrala Nûkleer a Sovyeta berê Çernobîl peqiya. 10 hezar mirov ji ber radyasyonê mirin û bi hezaran mirov jî ji ber radyasyonê seqet man.

Radyasyona ku ji santralê li derdorê belav bû, li ser surîştê jî pir tesîr çêkir. Li qeraxê Behra Reş, li Tirkîyeyê jî radyason kete xwarin û wexari-nên wekî çay, bindeq. Dewletê ji ber ku çay û bînan nîkaribû bifroşe der-veyhi welat, li bazaran firote gelê xwe.

AWIR



Faik Bulut

'Şoreşa îro modern e'

Faik Bulut di panela bi navê "Serhildanê Kurdan" de gote ku PKK partiyeke cihêreng e û wekî PDK'ê û YNK'ê, ji bo Kurdistanê otonom, nîv-demokrat şer nake.

Navenda Çanda Mezopotamyayê Şaxa Beyoğlu panelek bi navê "Serhildanên Kurdan", roja 17'yê avrêlê pêk anî. Pêşkêşvanê panelê lêkolîner û nivîskarê kurd Faik Bulut bû. Bi qasî 150 kesî guhdarî li semînerê kir.

Faik Bulut di destpêkê de got ku dîroka kurdan ji serhildan, pexilî û ji berxwedanan pêk hatiye û dîroka serhildanên kurdan di bin sê beşan de nîrxand: Serhildanên klasîk, Serhildanên dema di avabûna komara tirk de û Serhildana modern. Bulut ew jî ne wekî serhildan, lê wekî şoreşeke girseyî bi nav kir.

Bulut, di nav beşa yekemîn de serhildanên di navbera salên 1806 û 1880'yê de nîrxand. Li gorî Faik Bulut, mîrên kurd li hem-berî baca osmanîyan û kêmbûna statûya xwe serî hildane. Di van serhildanan de, artêşên mîran ên bi qasî sed - dused hezar peyayî, li hemberî artêşa osmanî diketin şer. Ev serhil-dan heta salên 1880'yan didomin. Piştî ku ew mîrîti jî holê radibin, îcar şêx, seyid û hwd. rêberiya serhildanan dikin, wekî Seyid Ebdulqadir, Seyid Ubeydullah û hwd. Armanca van serhildanan ne Kurdistanê ser-bixwe bûye, li tenê ji bo hin mafên bînge-hîn, wekî jîholêrakirina bacê bûye. Serokên serhildanan jî ber girêdayîbûna xwe ya bi xelîfetiye û ola îslamê ve, zêde tiştekî nax-wazin.

Di beşa duyemîn de jî serhiladanê ku di dema avabûna komara tirk de pêk hatine nîrxand. Faik Bulut dide zanîn ku ew jî ji sala 1909'an heta 1938'an didomin. Di wan serhildanan de jî şêx û seyidan pêşengî kirine. Her çiqas li pişt wan, rêxistinên wekî

Xoybûn, Azadî û "Kürt Teali Cemiyetî" he-bîn jî, bi awayê polîtîk û fermî li ser gel te-sîr nekirine. Rêberên serhildanan bi tenê we-kî serokê serhildanê hatine dîtin û di qada navneteweyî de tu nav û deng nedane.

Ew serhildan jî bi awayê girseyî çêbûne, ev jî, ji bo serhildêran bûye sedema proble-mên mezin. Her wiha wan rêxistinên baş pêk neanîne, di warê polîtîk de tu pêşketina wan nîn e. Bi tenê di nav xwe de, bi riya ol-dariyê bi hev girtine. Ji bo Kurdistanê ser-bixwe, tenê Serhildana Koçgirî û Serhildana Çiyayê Agirî derketiye holê.

Lêkolîner Bulut, di beşa sisiyan de jî şo-reşa ku îro didome, hilda dest. Wî got: "Tiş-tê ku îro PKK dike ne serhildan e, şoreşeke girseyî ye. PKK, di warê siyasî, leşkerî, abo-rî, ragihandinê de şoreşeke girseyî û modern pêk tîne."

Faik Bulut wiha axaftina xwe domand: "PKK dizane îro ji bo çi şoreşê dike û dax-waza wê jî diyar e. Lewre PKK ji partiyên kurdan ên din cihêtir e. Cudatiyeke wê heye; wekî PDK'ê û YNK'ê ji bo Kurdistanê otonom, nîv-demokrat şer nake. Daxwaza wê bi vê mînakê rê dede: Dema mirovek di riyekê de dihere, heke qedehek dew bidinê, dibêje 'Xwedê ji te razî be' wexta nedinê riya xwe didomîne. Şoreşa ku îro ew dide, li tevî Kurdistanê belav bûye, ne wekî serhil-danên klasîk e ku bi tenê li herêmekê bi sînor maye. Ew şoreş li Bakur, Başûr, Rojava, Rojhilat li her derê Kurdistanê didome. Ji Kirmanşahê heta Sêwazê. Ev jî nîşan dide ku PKK şoreşeke girseyî ji bo kurdan pêk tîne."

METİN AKSOY

ÇAVDÊRÎ

FIRAT CEWERÎ



Yekîtiya zimanê kurdî

Mîna tê zanîn ji ber bîkaranîna zimanê kurdî, ji ber pêşneketina Kurdistanê, zimanê kurdî bi devok û zaravayên xwe, ji hev bi dûr ketiye; serpêhatiya Dema Navîn ya Ewropayê dijî. Niha, ji bo ku em vî zimanê bikin yek an jî em ji vî zimanê zimanekî standart û yekgirtî derxînin, divê em digel şertên objektîf ên welêt, çavekî jî biavêjin dîroka mîletan û li riyên avakirina yekîtiya zimanan binêrin.

Li her derê dinyayê, çi bigire di hemû zimanan de devok hene. Di hinek zimanan de jî zarava hene ku xelkê wî welatî an bi zehmetî ji hev têdighîjin, an jî qet ji hev tînahîjin. Ev ji ber gelek tesîrên cografî û civakî wilo ne. Vêca, ew jî bo avakirina zimanekî standart, ji zaravayekî bi rê ketine û ji wî zaravayî bi riya asîmîlekirina zaravayên din, zimanekî standart ava kirine. Ew zaravayê ku bûye sereke an jî bûye serdest, bi piranî zarava an jî devokên ku li der û dora qraliyetê tê peyivîn e. Ew zimanê standart bi vê riyê çêbûye.

Em dibînin ku desthilatdariya siyasî rast an ne rast, di warê yek-kirina zimên de roleke mezin lêvîtiye. Mirov vê rolê, ne bi tenê di dîroka Ewropayê de, her wiha li Kurdistanê jî baş dibîne. Di dema bihurî de, ji ber Mîrektiya Botan, em dibînin ku piraniya edebiyata me ya klasîk bi devoka Botan û Hekariyan hatiye nivîsandin. Ev wê nîşan dide, ger Mîrektiya Botan neketa, firehtir bûbûya û bûbûya dewlet, wê îro zimanê kurdî yê standart yê nivîsandinê devoka Botan bûya. Ger Serhildana Seyid Riza bi ser biketa, zimanê fermî dikaribû bibe dimilî.

Her wiha ger birêvebirên dewletê ne bi ilmî, lê bixwaze bi zorê zimanê xwe li ser xelkê ferz bike, dikare. Gava Mustafa Kemal cumhûriyeta xwe îlan kir û paşê alfabeya latînî û zimanê tirkî li ser xelkê ferz kir, xelk mecbûr ma ku bide ser riya desthilatdariyê. Cumhûriyeta Tirkîyeyê bi vê biryara xwe gelek zimanên din jî asîmîle kirin û ji ortê rakirin. Em di vir de dibînin ku ji bo yek-kirina zimên, desthilatdariyeke siyasî lazim e. Ev jî dewlet e. Dewlet dikare di riya yek-kirina zimên de yekîtiya mîlet jî ava bike. Ji bo avakirina zimanekî standart otorîteyek lazim e. Lê ger otorîteya ku heye totalîter be, zimanê ku ava bike, wê dûrî pîvanên zanist û zimanzanîyê be, lê wê dîsan jî piştî salên dirêj zimanekî standart û yekgirtî ava bibe.

Divê em ji bo yek-kirina zimanê kurdî û her wiha ji bo di her warî de bîkaranîna zimanê kurdî li benda avakirina dewletê ranewestin. Em dizanin ku îro zimanê kurdî ji sê zaravayan pêk tê. Her zaravayek di hundirê xwe de ji gelek devokan pêk tê. Tiştên ku rewşenbîrên kurd divê bikin, ev e: Divê ew bi her awayî bixwazin zaravayên xwe ji devokan biparêzin. Yanê her zar-avayekî kurdî di warê xwe de bibe standart.

Her çiqas hebûna dewletê û desthilatdariya siyasî ji bo avakirina zimanê standart rola herî mezin û berbiçav dilîze jî, divê em li benda avakirina dewleteke kurdî ranewestin. Ji niha ve divê em Celadet Bedîrxan bîngeh bigirin û di her warê jiyana siyasî, civakî û edebî de zimanê kurdî bi kar bînin. Em zorê bidin weşanên bi kurdî, em bi kêmanî du-sê rojnameyên kurdî, sînemaya kurdî û kanalên televîzyonê jî bi kurdî ava bikin.

Erê, zimanê kurdî hebûna kurdan e, nasnava kurdan bi zimanê kurdî ve girêdayî ye.

Yek-kirina zimanê kurdî, destpêka yek-kirina gelê kurd e...

Nîşe: Ji ber ku nivîsa nivîskarê me Amed Tîgrîs nekete destê me, di cihê wê de me ya Firat Cewerî weşand.

Hunermend Ahmet Kaya:

Kurd mafê xwe dixwazin...

Cep, rast, îslamî, kurd, tirk... Di civakê de ji her fikrî mirov li stranên we guhdarî dikin, hûn vê çawa dinirxînin?

Çend sal in ku xirecîr li ser muzîka taybet, muzîka xweber (özgün müzik) û muzîka protest dikin, lê ez nikarim bibêjim muzîka min bi temamî protest e, li gorî min ez muzîka civakî ya realist çêdîkim. Civak jî ne tenê ji çepan, ji sosyalîstan pêk tê. Û ne tenê çep in. Di civakê de belengaz û mezlûm... Yanê bêhtir mezlûm, belengaz û reben li min guhdarî dikin.

Ji aliyê qismek çepan ve hûn gelekî tén rexnekirin, ji bo çi ye gelo?

● Bi rastî baş tê nagihê. Di serê xwe de ez xistime şeklekî ku ez naecibînim, min nexwestiyê; dibêjin Ahmet Kaya şoreşger e, lê ne li gorî şoreşgeriyê dimeşe... Ez sosyalîst im, lê ne ew şoreşgerê ku ji bo min di serê xwe de çêkirine me... Ez sosyalîst im, ji aliyê feqîr û belengazan, ji aliyê karkeran im û heta dawiyê jî ez dê li ser vê fikrê bim, lê ne bi şeweyê ku ew ji min dixwazin, bi şeweyê ku ez dixwazim û dikarim... Ez nikarim di nav rêxistînan de cih bigirim, ji min nayê...


Muzîka we jî wekî "arabesk" dinirxînin û li ser vê jî we rexne dikin; muzîka we arabesk e, û arabesk qey gelek xerab e?

● Li gorî min arabesk ne xerab e, û xerab jî be, kultura me ev e, kultura me kultura arabesk û "çiğköfte"yê ye... Min tu carî xwe wekî yekî ewrûpî nehesibandiye, ez ji Rojhilata Navîn im, û bi kultura vî erdî pijiyame, ez dê bo çi muzîka ewrûpiyan bi kar bînim! Koka min çi be, ez jî ew im. Û ji ber ku tesîra ereban û ya gelek miletên din li ser kultura me heye, wê ev tesîr di muzîka me de jî hebe... Ez ji muzîka şoreşger jî fêhm nakim û nizamim ev tê çi maneyê! Ma di muzîkê de qalibên şoreşger û yên ne şoreşger hene? Yanê kîjan nota, şoreşger in û kîjan ne şoreşger? Do, re, mî, fa... kîjan? Û kîjan nota oportunist e?!

Mirov bi çi kulturî bijî wê di muzîka xwe de, di hemû warên hunerê de wî bi kar bîne. Di hunerê de çi ji dilê mirov were û çi ji mirov bê, divê mirov wê bike. Heke na, serkeftin çênabe. Tiştê ku ji dilê mirov neyê û mirov jê hez neke, wê mirov çawa bikaribe bi hinekên din bide hezkirin!?

Bi rexneyê wan nerihet nabim, lê ku bibêjin muzîka Ahmet Kaya teslîmkar e, xwespartina qederê diparêze, ev ne rast e. Ka di ku dera muzîka min de teslîmkarî û qederwarî heye, bidine nîşan!

Hunermend Ahmet Kaya, ne tenê bi muzîka xwe ya xweber her wiha bi axaftinên xwe yên balkêş jî kesekî navdar e. Çi tê devê wî dibêje, tiştê di dilê xwe de nahêle. Hevalê me RAHMÎ BATUR li ser muzîk û jiyana wî pê re peyivî.



Ji muzîka we xemgînî difûre...

● Xemgînî tiştêkî din e, xemgînî ne qedewarî ye... Li stranên kurdan guhdarî bikin, mirov ji gotinên wan fêhm neke jî, giriyê mirov tê... Mirov nikare ji vê re bibêje teslîmkarî, di nav xemgîniyê de serhildaneke taybet heye...

Di her warê hunerê de ji xwe xemgînî heye...

● Belê, heye... îro li vî welatî însan birçî, reben, pepûk û belengaz in, û di her warî de siyaseta neheqiyê tê meşandin. Ê ku bi awayekî dilnêrmî jî li ser vê rewşê nesekine, nikare ji bo vî şer jî bike. Ez hunermendekî serbixwe me, nikarim ajîstasyonê bikim, çi ji dilê min tê, wî dikim; yên ku naecibînin ne mec-

bûrî guhdarîkirinê ne, lê ne mecbûrî dijminahiya min in jî...

Di bin çermê mirovên vî erdî de, di kûrahiya dilê wan de xemgîniyêke tarî heye... Di nav wan kesên ku we rexne dikin de jî, yên ku li we guhdarî dikin hene?

● Ez bi xwe jî, ji xemgîniyê hez dikim û bawer bikin kêma ji wan kesên ku min rexne dikin hene ku li muzîka min guhdarî nakin, piraniya wan guhdarî dikin...

Kompleksên min hene: Ez bi eslê xwe kurd im bi gelek aliyên jiyana Rojava ve, bi mirovên wan ve muşkileyên (problem) min hene; gelek aliyên min û wan li hev nakin.. Ez nikarim herim diskotekan, di nava wan de xwe biyan

dibînim, bêhêz û huner dibînim, aciz dibim... Ez li Semsûrê (Adiyaman) çêbûme, li Meletiyê mezin bûme û hatime Stenbolê, ez nikarim wekî wan bijîm...

Ma kêmasiyeke gelek mezin e, ku mirov wekî xwe bijî?

● Çima kêmasî be! Ez wek kêmasî nabînim, lê yên ku dibînin ne kêma in... Tiştêkî xerîb e ku ew dewlet destûra konserê ji bo arabeskvan Ahmed Kaya nade, lê hevalên me yên şoreşger her roj dikarin konseran çêbikin û çêdikin jî...

Ji bo çi destûr nadine we?

● Dibêjin em nikarin ewlekariya we bikin, we biparêzin! Vê wek sedemê dine nîşan...

Bi taybetî li bajarên kurdan kasetên we ji aliyê dewletê ve hatine qedexekirin, hatine berhevkirin; ev jî ji bo ewlekari û parastina we nebe?..

● Dibe, dibe! Her em ji wan fêhm nakin, lê ez ne bawer im ku ew jî ji xwe û ji karên xwe fêhm dikin...

We di axaftineke xwe de digot: "Li ser zimanê tirkî min rexne dikin, dibêjin tirkî nizane, baş bi kar nayîne, rast e, ji ber ku kurd im bi tirkî baş nizamim" baş e, hûn bi kurdî dizanin?

● Na, nizamim. Û tiştê xerîb jî ev e: Bi kurdî hîç nizamim, bi tirkî jî baş hîn nebûme... Ev baş hate hişê te; muzîka min jî hinekî wiha ye; çawa ku kurdî nizamim û tirkî hîn nebûme, vê tevliheviyê di muzîka min de jî cih girtiye.. Yanê ez nikarim bi hêsanî navekî jî li muzîka xwe bikim, tenê dikarim bibêjim ku çi ji dilê min tê, ez wê çêdîkim, wê dibêjim...

Îro jî, wekî berê yekî ku dengê wî xweş be, dikare were di vî bazarê de bi pêş bikeve, ji ber ku hemû îmkân di destê du sê şirketan de berhev bûne, sîstema tekelê di warê muzîkê de jî rûniştîye?

● Rast e, îro li vî welatî her tişt zehmet bûye, lê yên ku di hunera xwe de xurt bin, dikarin bi pêş bikevin. Ez bawer dikim ku îro jî ez jî sifirê dest pê bikim, dîsa jî ezê di nav şeş mehan de, bibime Ahmet Kaya.. Wexta ku hûnereke xurt hebe, rîya xwe vedike...

Hinek hunermend carekê ku ber bi jêr ve çûn, êdî hew dikarin derkevin û hêdî hêdî ber bi jibîrkirinê ve diçin. Lê hûn ne wisa ne, kaseteke we baş neyê ecibandin, ya piştî wê baş tê firotin. Hûn vê serfiraziya xwe çawa dinirxînin?

Ji devê Ahmet Kaya jiyana wî:

Di sala 1950'yan de li bajarê Semsûrê hatim dinê. Di şeş-heft saliya xwe de min dest bi tem-bûrê kir... Piştî ku em demekê li Meletiyê man, di deh-yanzdeh saliya min de, em hatine Stenbolê .. Di 15 saliya xwe de min dest bi siyasetê kir û hê jî didomînim, lê tu carî min



nekarî di nav disiplîna rêx-istinekê de cih bigirim. Tiştê ku min dixwest; Ahmed Arif û Enver Gökçe di şûrê de çi kirine, di muzîkê de jî ez wê bikim, lê bi temamî ev jî min nehat, min nekarî. Hunera min têrê nekir... Ez endamê Sendikaya Hunermendên Rojhilata Navîn im. Ev Sendîka di bin Serokatiya Marsîn Halef de karên xwe dimeşîne û Marsîn Halef mûzîkarekî pir baş û bi nav û deng e. Sendîka li Bêrûdê ye û jî Tirkîyeyê ez tenê endamê wê me.

daxwaza me ew e, em bi were şer bikin!" bidin heye? Ez ne bawer im û kes jî ne bawer e ku wê hebin...Îro bi saya vî şerî, xelkê di xew ve dibin, lê heke tiştên ku bi millet dibin, millet pê bihesse, tu dizanî ku wê çi biqewime? Bi namûs tu kes û tu hêz êdî nikare serê vî miletî bitewîne!..

Li Tirkîyeyê mûzîkarên ku tu diecînî hene, ku hebin kî ne?

● Gelek in... gelek kes di vî warî de keda xwe didin...

Em kedê bidin aliyekî, yên ku tu wan wekî mûzîkarekî baş û hunerxurt dibînî hene?

● Kesên ku kaset çenekirine li vî alî, li wî alî xebatê dikin tene aqilê min, lê di vî piyaseyê de mûzîkarên baş nas nakim. Ez jî Mahzûnî, Arif Sağ, Neşat Ertaş, Sezen Aksu, Ferhat Tunç û Grup Yorum gelek hez dikim û gelekên din jî hene ku ez ji wan hez dikim. Lê ku tu bibêjî mûzîkarekî baş; bi rastî kes nayê hişê min... Û ez jî karê xwe jî ne razî me.

Hûn li mûzîka kurdî guhdarî dikin?

● Belê, lê guhdarî dikim..

Ciwan Haco?..

● Lê guhdarî dikim, li xweşê min jî diçe... Lê ez bêtir ji mûzîka kurdan ya otantik hez dikim.

Serekê malê kî ye?

● Di mala me de serekatî nîn e, wekî her kurdî ez jî, ji jina xwe ditirsim! Lê bizanibin ku aborî di destê min de ye, ji ber vê jî ez dikarim carinan dest bibime xwe!..

Gotina we ya dawîn?

● Daxwaza min her rawestandina vî şerî ye. Bi hezaran mirov tene kuştin ma ne heyf e!..

şe, lê ruh, ruhê xezîmî û amatoriyê be, e?

● Rast e.. Divê wisa be, lê tu bixwazî nexwazî dema tu bûyî profesyonel, ji ruhê te jî gelek tişt diçe. Yanê gelek tişt di teoriyê de dimînin...

Hûn ji bo ku bi kurdî jî bistrên fikirî an jî difikirin?

● Gelek fikirîm, lê naxwazim tiştên nebaş çêbikim. Ditirsim ku nebaş çêbibe. Bi kurdî nizanîm. Divê mamosteyekî baş hebe ku bi min bide xwendin, heke min xwend û nekarî awaza kurdî bidim, serfiraz nebûm, wê xêra wê bibe çi?

Di şevê de guhdaran hûn zêde rexne kiribûn...

● Çi rexne û çi hal! Li min "yuh" barandin! Lê bawer bikin hinek ji wan kesên ku ji bo min digotin "yuh" beriya ku ez derkevime sahneyê (dik) hatibûn ji min wêneyê bi îmze xwestibûn....

Ji bo kaseta we ya yekemîn şirketê pere dabû we, an na?

● Dev ji ya yekemîn berde! Heta kaseta min a bi navê "An Gelir" tu pere nedane min, û ji bo kaseta çaremîn (An Gelir) milyonek û şeş sed hezar tenê dabûne min...

Rexneyên ku li we bûne û ji we re xerib hatine, hene?

● Gelek in, lê berî niha bi demekê di rojnameya Evrenselê de ji bo min wiha nivîsandibûn: "Kesên li qeraxa Boğazê di vîlaya xwe de û di destê wî

de qedeha vîskiyê hebe, nikare stranên cîvakî çêbike, ev nabe! Gerek e behsa kuştinên bêmehkemekirin jî neke!" Li qeraxa Boğazê vîlaya min her nîn e, lê ez dibêjim xwezî Müslüm Gürses, xwezî Ferdi Tayfur jî li ser kuştinên bêmehkemekirin biaxifin.. Bibêjin li vî welatî mirov tene kuştin! Ma ev xerab e? Dibêjin "Na, tu arabeskvan î, heqê te tune ye tu doza me biparêzî!" Yaho, ma ev meseleya we bi tenê ye! Were ji nava vê derkeve, were tê bigihîje!..

Li ser pîrsgirêka kurdan û siyaseta tîrkan hûn dikarin çi bibêjin?

● Siyaseta dewletê bi tu awayî serfiraz nabe. Bixwazin, nexwazin wê mecbûrî astiyê bibin, bi zor û lêdan tu tişt çareser nabe. Divê di demeke kurt de û bi lez, hemû kes aqilê xwe bidine serê xwe, ji bo astiyê ji bo selametiya gelê tirk û gelê kurd vî şerî rawestînin. Gelê kurd çi dixwaze? Dixwaze bi zîmanê xwe biaxive, binivîsîne, bixwîne û televîzyoneke kurdî hebe... Gelo ev daxwazeke gelek giran e, çi zirara wê ji kê re heye? Kurd ne li pey cudabûnê ne, derdekî wan ê wiha tune ye. Mafê xwe dixwazin û hew...

Hemû kes dibêjin ev şer xerab e, menfîetê me tene tune ye, lê dîsan jî didomînin. Gelo çima û kî ne yên ku vî şerî didomînin?

● Ku tu ji min bipirî, yên ku vî şerî didin domandin emperyalîst bi xwe ne. Ne tenê pîrsgirêka kurd heye, gelek pîrsgirêkên din jî hene. Ku bibêjin "Werin ka hûn çi dixwazin?" Kesekî ku bersiva "Em tiştêkî naxwazin, tenê


● Gel hesab û kitêba xwe baş çêdike.. Ew dizanin çi ji dil tê û çi ne ji dil. Dema ku tenê li ser profesyoneliyê bisekinî, serfiraz nebî, lazim e tu guh bidî dilê xwe, lewma guhdar jî bêtir guh didine dilê te, heke te dilê xwe ji wan re vekiribe, ew jî te hembêz dikin, lê na, tu guh bidî hinek kesên ku modern û zanyarî dibêjin, profesyonelî dibêjin, nameşe... Kaseta min a "Şarkılarım Dağlara" (Stranên min ji çîyan re) milyonê û şeşsed hezar firot, gelek kes ji vî nerihet bûn. Di ya dawîn de, min got ez kesî aciz nekim, kaseteke navsere çêbikim, ji ber ku di profesyoneliyê de, dema tu gihîştî cihekî, bi gotina tîrkan "hem nalîna hem mihîna vurmak" lazim e, divê tu daxwazên çar alî bidî ber çavên xwe.. Ku tu yekalî herî, asteng derdixine pêşîya te û dema ku tu ketî nav labîrenta wan, êdî nikarî derkevi (Bi awayekî teslîmkarî divê nefikirin, ez ji derdorên hunerê behs dikim, ne ji sistemê û ji polis û zabîten wan, min ji panzdeh saliya xwe ve ew tirs şikandîye) lê ev kaset wekî ya din nehat firotin. Sebebê vê jî ew e ku dema ne li gorî fikrê û ramana xwe, ne li gorî daxwaza dilê xwe çêbikî, nayê ecibandin.

Profesyonelî çi dide mirov û çi ji mirov distîne?

● Berî her tiştî, aliyê mirovan ê finansî hinekî ko dike, ji her awayî ve mirov hinekî xera dike.... Lê ku mirov bikaribe di dilê xwe de profesyoneliyê dimeşîne, ne xerab e û ji bo ku kar bi êk û pêk bimeşe, lazim e jî....

Yanê divê kar bi profesyonelî bime-

Ji bo aştî û guherîna sîstemê



A.MELİK FIRAT

Armanca tevgera me ew e, ku dewlet vekîşe nav çarçoveya mafên mirovan a cîhanî, xwedî li mal, can û namûsa millet derkeve, bîr û baweriya wan biparêze. Mesûliyetên dewletê yên bingeîn ev in. Ji xeynî van, divê millet bi xwe xwedî mafê hîlbijartinê, yê yekane be û berpirs be.

Serokwezîr Mesut Yılmaz, beriya hîlbijartinan soz da ku ewê vî şerî rawestînin û, pîrs-girêka kurdî ya ku li serê wan jî bûye bela, çareser bikin... PKK'ê jî qerara agirbestê da û şer rawestand. Her çiqas operasyonên dewletê berde-wam bin jî, Mesut Yılmaz hê jî dibêje: "Em dê demokrasiyê binin, pîrs-girêka kurdî çareser bikin" û hemû kes li ser çareserkirina vê pîrs-girêkê disekine.

Du sal berê, min û Mahir Kaynak, Hasan Mezarıcı û Altan Tan ji bo rawestandina vî şerî û çareseriya pîrs-girêkê welat, me deklerasyonêk îlan kiribû. Ez dixwazim ku careke din xwendevanên me, di wê deklerasyonê de me çî parastibû, bizanibin, ji ber vê jî, careke din ez wê deklerasyonê bi kurtahî pêşkêşî xwendevanan dikim:

"Armanca vê tevgera siyasî ya ku bi navê Tevgera Avabûna Jinûve", dest pê kiriye, ev e: Li şûna millet û dewleta ku li ser hîmê şoreşa zamanê yek-partîtiyê hatiye avakirin, werin em dewletê li gorî daxwaza milletê xwe, ji nû ve ava bikin û her wiha zagona (qanûn) bingeîn jî dîsa li gorî daxwazên cihêreng ên vî milletî ku ji hev cihê cihê ne, sererast bikin.

Bi awayekî din, em di baweriya ji binî ve guhertina vê dewleta ceberûd de, ku tu carî kesî bi tu awayî nekariye ji xulqiyeta wê sîual bike. Her car kesê ku dil kiriye şeklê hebûna wê ya wekî dogmayeke efsanewî bide ber pîrsan, mîna ku gunehekî neteweyî kiribe, pê-lepaş li xwe vegeriyaye û her tim jî vê dewletê re îtaat hatiye kirin, tu carî hî-nî dayîne nebûye, her standiye; bi tu awayî kesî nekariye şeklekî bide wê, lê wê çî cara xwestiye karibûye hemwelatiyên xwe ji şeklekî bixe şeklekî din.

Em jî dixwazin bawermendiya vê dewleta ceberûd serobino bikin, ji binî ve biguherînin (bi şertê ku li gorî qîma millet be) û wê li gorî normên hiqûqê nû bikin, li herêmê û temamê dinyayê.

Ji şes tîrên şoreşên Firqa Gel a Komarperestan ku vêga rêça Firqa Ittîhâd û Terakî'yê dişopînin, "Komarperestî" bûye dîktatorî, "Gelperestî" ji çînekê re bûye rantiye ku xelkê bişlînin, "Şoreş-vanî" her rê li ber derbeyan vekiriye, bi "Dewletperestî" yê hemû şeklê xwînmi-jî û xapînokiyê bi destê KÎT'an û ban-

kayên dewletê hatiye kirin. "Netewe-perestîya Atatürk" bûye nijadperestî, "Laîkî" bûye bêdînî û dewlet tevde li ser bingeha vê partiya yek a çewt ava bûye û li gorî vê şeklekî xweser standiye.

Ev şeklê çewt yê vê dewleta ku li ser hîmên şoreşên yek-partîtiyê ava bûye û bi "Prensîbên Atatürk û Înqilabên wî" têne bi navkirin, ji bo zagonên derbeyan ku ne têne guhertin û ne jî têne rexnekirin bûye sebeb. Ji ber vê awayê dewlet li şûna ku li riya çareserkirina pîrs-girêkan bigere û wan ji hev derxe; bi serê xwe bûye çavkaniya pîrs-girêkan.

Hemû partî û saziyên dewletê ku bû-ne mehkûmên şoreşên Firqa Gel a Komarperest, rê li ber îmkana guherîn, xwenûkirinê, demokratbûn û avabûna jinûve girtine.

Armanca tevgera me: Ji binî rakirina şoreşên şes tîrên Firqa Gel a Komarperest e. Lewre ev firqa bi wan şoreşan ne dîroka milletê me, ne kultura wê û ne jî îdeoloji, dîn, hiqûq, exlaq, cografya û daxwazên wê yên cihêreng nas dike. Karê wê qedexekirin, astengî û bi zagona bingeîn ya derbeyan avakirina îdeolojiya fermî, ku tu nikarî "rexne bikî" û nikarî "biguherîni" ye.

Tevgera me dixwaze van hîman tevî sazgehên raserî meclîsê yên wekî, 'DGM', 'MGK', 'Anayasa Mahkemesi' jî binî hilweşîne û rê li ber avabûna jinûve û guherînê veke.

Armanca tevgera me ew e, ku dewlet vekîşe nav çarçoveya mafên mirovan a cîhanî, xwedî li mal, can û namûsa millet derkeve, bîr û baweriya wan biparêze. Mesûliyetên dewletê yên bingeîn ev in. Ji xeynî van, divê millet bi xwe xwedî mafê hîlbijartinê, yê yekane be û berpirs be.

Îtiraza millet a ji bo kar û bar û felsefeya dewletê, di cihê ku wekî li dijî dewletê îşyan û serhildan were fêmkirin, divê wekî wezîfeya wî ya tebîî û hemwelatiyê bê fêmkirin. Dema millet xwest ku dewlet bide bixê, divê ne wekî felakeî, wekî yekbûna dewlet û millet û wekî fazîletê bê hesibandin.

Armanca tevgera me ew e, ku sîstema perwerdehiyê were guhertin, dev ji siyaseta "yek tîp hemwelatî" yê bê berdan, sîstem ji destê komek mirovên ku

xwe dewlet îlan kirine, û ji astenga Tevhîd-î Tedrîsatê were rizgarkirin; hemû kes bi bîr û baweriya xwe bîjin, û divê hemû kes li gorî hunerên xwe bîkaribin îmkanan bi destên xwe bixin.

Di nav hemwelatiyan de, cihêrengiya ziman, ol, mezheb, îdeoloji û qiyafet divê ne wekî nîfaq û ji hev cudabûnê bête fêmkirin. Daxwazên millet lazim e neyên qedexekirin. Lazim e hemwelatiyan nexine nav şablona fermî, yekşêwe û divê dewlet ne "teref" be, li dijî mafên kesî dernekeve, bibe "hakem dewlet."

Armanca tevgera me ew e, ku em dewletê ji dagirkeriya kadroyên ku gelek car bi tarzê ne meşrû çavkaniyên aborî bi dest dixin û vê di siyaseta de bir kar tînin, rizgar bikin. Em vê sîstema (Siyaset-bertîl-siyaset) ku bûye wekî huner bişikînin. Ev hêzên ku dewlet bi dest xistine, her tim millet bi hebûna neyarên derve û hundir tirsandine û daxwazên wan bi paş ve dane.

Armanca tevgera me şikandina vê rewşê û bi xwe bawerkirina millet e. Em dibêjin, pîrs-girêkên Tirkîyeyê jî, wekî yên hemû welatan têne çareserkirin. Em dixwazin mirovên xwe ji hesabên biçûk û egoîstî dûr bixin, ku li nîrxên xwe yên qenc û baş, xwedî derkevin.

Armanca tevgera me ew e, ku dewlet di warê îktîsadiyê de, tenê bi pere, di avakirina bingeîn de, di warê ewlekarîyê de, di warê avahiyan de karê xwe bide meşandin, di serî de, KÎT û BÎT'an (Spî) tasfiye bike û hew di warê ticaret û sanayiyê de xebat bike.

Armanca tevgera me ew e, ku dewleta me û milletê me bi dîne xwe re, bi tarîxa xwe re, bi cografya xwe re li hev were, ji bo hundir û derve siyaseteke nû deyne, Tirkîyeyê bi qafqasan, balqanan, Afrîka, Rojhilata Navîn û dinayayê re lihevhatî be, û bibe dewleteke dinyayî.

Ev tevger, li mîrasa Tirkîyeyê ku deynê osmaniyan daye xwedî derdikeve, li tiştên xwe yên rind û baş ên paşeroja xwe çawa xwedî derdikeve, tiştên ne baş û xerab jî ku qewimîbin qebûl dike û ji bo ku dubare nebe jî, her çiqas tasfiyeya îdeolojiya fermî dabe ber xwe jî, vê jî ji tarîxa xwe wekî parçeyekî bêsî-ûdiya xwe dibîne.

Em jiyana dewlet û milletê di herikî-

neke tarîxî û tabîî de şîrove dikin û programa xwe ne li gorî paşerojê, ji dinyê cuda, teorîk û xeyalî, li gorî vê demê ku bi şeklekî realîst pîrs-girêkên kombûyî çareser bikin, hazir dikin.

Armanca me ew e, ji ber ku "laîkî" ji aliyê piraniya milletê me ve nayê pejirandin û "neteweperestîya Atatürk" ji aliyê piraniya milletê me ve nayê ecibandin, biguherînin, dewlet û millet li hev binin.

"Zimanê dewletê yê fermî tirkî ye. Hemwelatiyên me di parastin û pêşvebirina nasnameyên xwe yên dînî, mezhebi neteweyî de azad in." Em dixwazin sîstemeke bi vî rengî ava bikin, bi vî awayî pîrs-girêkên kevnare çareser bikin, dawî li şer binin, Komara Tirkîyeyê bikin dewleta hemû kesên wî welatî. Cudabûnên xwe yên dînî û neteweyî di tîkiliyên xwe yên derve de, em dixwazin bikin nîrxên bifeyde.

Di nav partiyan de, ev tevger bi rengekî cuda hatiye îlankirin. Ji ber ku bi tecrûbeyên heftê salan û bi bedelên gelek giran hatiye fêmkirin ku ev îdeolojiya fermî, ev welat aniye halê xerabûn û parçebûnê.

Êdî wext tune ku li pey van partî û rêxistinên ku ne diyar in wê çî bikin, sîstemê biguherînin an na, em xwe bixapînin. Ne diyar e ku ewê çî, çawa biguherînin, çî hildin, çî bixine şûnê. Guherîn dixwazin, naxwazin? Ev jî baş ne diyar e.

Em ne wekî hinek partiyan ku bi neteweyî, mezhebi, aborî û îdeolojîk û li dijî dewletê, li dijî memûrên dewletê, li dijî partî û civakên cihêreng ku mûxalefeteke fanatîk didine meşandin û pîrs-girêkên herî girîng ji rojevê derdixin. Tevgera me wê bi dewlet û memûrên dewletê ku wekî alet di parastina sîstemê de têne emilandin re şer neke, xwe ji vê dûr bixe, ev bi ser de bîn jî, wê ew tîkoşîna xwe li dijî sîstemê bide.

Em li dijî vê sîstemê ne, ku dewleta me û milletê me bêtaqet xistiyê, di nav îşgal û derbeyan de, bi îdeolojiya yekpartiyê ku hêzên dewletê bi şelandinî, li dijî millet derdixin.

Tevgera me, li dijî sîstema ku bi qanûnên bingeîn ê derbeyan, "nayê guhertin û nayê rexnekirin" danîn e, milletê xistine nav şablona dewlet-millet, wê bi alîkariya mûhalîfên din, bi rêxistin û kadroyên xwe, bi berxwedanên sîvil ve, programa xwe yê guherînê bide meşandin.

Em dibêjin sedemên pîrs-girêkên Tirkîyeyê jî avabûna dewletê ya xelet ku li ser şoreşên yek-partiyê hatine avakirin e.

Em dizanin partiyan ku tenê guherandina meclîs û îxtîdar dane pêşîya xwe, nikarin van guherînan çêbikin.



Li Navenda Çanda Mezopotamyayê vê heftiyê ev çalakî hene.

● 22.4.1996 Duşem

Panela li ser Rojnamegeriya Kurdî, saet 18.00

Birêvebir Nijat Yavuk. Beşdar Zana Farqînî (Azadiya Welat), Latif Özdemir (Ronahî), Süleyman Çelik (Nûbihar), Yakup Karademir (Armanc), Hayretin Çelik (Demokrasi), A. Zekî Okçuoglu (Doz), Ramazan Öztürk (muxabîrê şer)

Saet 18.00- Konsera Koma Amed

● 24.4.1996 Çarşem

Saet 16.00- Semînera Enstîtuya Kurdî, li ser şarezatîyên kurdan yên Ser-

dema pêşîn û Navîn. Axaftvan FeqeHüseyn Sağnîç

● 26.4.1996 În

Saet 18.00- Konsera Metin Kahraman

● 27.4.1996 Şemî

Saet 14.00- Konsera Gulên Mezrabotan - 18.00- Kansera Grup Yorum Li Beksavê jî ku li Kadiköy e ev çalakî hene.

● 27.4.1996 Şemî

Saet 15.00- Zimanê muzîkê, Beşdar: Koma Dinmeyen Müzik

Sevin Eratalay, Koma Dengê Azadî

Saet 18.00- Konsera "Stranê me" Galip Gür

RÛDAN

Çiyagerî

Di warê çiyageriyê de gelek kesên ciwan jiyana xwe winda kirin. Divê ew kes wekî şehîdên mirovahiye bînin pejirandin. Lewre ji ber vê xebatên tenduristî, kîmya, xebata fezayî, ragihandin, teknolojiya metalurjiyê û hwd. bi pêş ketin.

Dîroka xebata çiyageriyê (dağcılık) ji 200 salî derbas bû. Ev xebat wekî sporê tê zanîn. Lê belê rastiya vê xebatê di tenê ev e. Ji ber ku armanca vê xebatê di destpêkê de ne tenê spor bû. Armanca bi piranî tenduristîya mirovan bû. Kesên zanyar xwestin ku hîn bibin ka tesîra çiyayên bilind li ser jiyana mirovan çî ye û çareserîya problemên ji ber vê tesîrê wê çawa bibe? Destpêka vê xebatê tê zanîn ku li Swîsreyê li ser bedelbenda (rêzeçiya) çiyayê Alpê dest pê kiriye. Ji ber vê yekê navê vê xebatê bûye Alpînî an jî, di sîplîna Alpan.

Di sala 1786'an de çend çiyagerên zanyar ji bona vê yekê hilkişîyan Girê Blankê (Mount Blanc). Ew gir li ser rêzeçiyayên Alpê cihê herî bilind e. Ku ev xebat gihîşt armanca xwe, êdî çiyageran bala xwe dan ser çiyayên din û berê xwe dan çiyayên asê. Hêdî hêdî gelek kesî ev jîyan ji bo xwe wekî armanca pejirandin û ew war ji xwe re girîng dîtin. Bi wî awayî hejmara kesên eleqedar jî zêdetir bû.

Çiyageran êdî çav li çiyayên Amerîka, Asya û Afrîkayê kirin. Pîrbûna van xebatan ji aliyê materyalên vî karî ve jî pêşketin û problemên nû anîn holê. Piştî hilkişîna ser çiyayên Alpê, îcar li Amerîkaya Bakur xebata ji bo hilkişîna rêzeçiya-

yên Andê dest pê kir. Li ser vê rêzê, dixwazin hilkişîna çiyayên Zinarî û vê yekê jî pêk tînin.

Pişt re jî (di sala 1889'an de) hilkişîna ser Çiyayê Afrîkayê yê herî bilind ê bi navê Çiyayê Klîmanjaroyê tewaw bû. Di sala 1894'an de gihîştin çiyayê Zellandaya Nû Girê Cook. Di sala 1913'yan de jî gihîştina zirveya (nîçikê) hemû çiyayên Amerîkayê û Girê Mc Kinley çêbû. Bilindiya wî çiyayî 6194 metre ye. Piştî şerê Cihanê yê Yekemîn ev xebat bi piranî rawestîya, lê belê çiyagerên Îngilîz xebata xwe meşandin. Di navbera van salan de bala xwe bi taybetî dan ser rêzeçiyayên Hîmalayan.


Wê demê di hate gotin ku, ev der banê gerdûnê ye. Çiyagerên Îngilîz li ser gelek xebat kirin û di vî warî de gelek serkeftin bi dest xistin. Dûv re jî komek çiyagerên Yekîtiya Sovyetê di sala 1933'yan de hilkişîyan ser rêzeçiyayê Hîmalayan û gihîştina xwe ya Girê Komunîzmê îlan kirin. Di pey vê serkeftinê de çiyagerên Îngilîz dîsa li ser gihîştina Hîmalayan dest bi xebatê kirin û gihîştin nîçikê Nanda Devî. Bilindiya vî girî 7817 metre ye.

Di nava wan salan de hêzên faşîst di bin serokatîya Musollînî de li Îtalyayê û di bin serokatîya Adolf Hitler de jî li Almaniyayê hatibûn iktîdarê û ji ber şerûdiya van komaran, rewşa polîtîkaya cihanê her ku diçû, xera dibû. Dûv re jî jixwe şerê Cihanê yê Duyemîn dest pê kir. Di navbera salên 1939 û 1950'yî de ji aliyê xebata çiyageriyê ve tiştên girîng pêk nehatin. Di sala 1950'yî de, çiyagerên fransîz li Hîmalayan gihîştin Nîçikê Annapurnayê û di vî derketinê de rekora bilindiya 8000 metreyê bi dest xistin. Ji ber ku bilindiya wî 8091 metre ye. Piştî vê serkeftinê êdî cihek mabû, ev jî girê herî bilind Everest bû. Îcar xebata ji bo derketina ser vî girî dest pê kir. Çiyagerên fransîz gelek xebat pêk anîn û azmûnên bêhejmar kirin. Di sala 1953'yan de serkeftin bi dest ket. Çiyagerên fransîz Everest zêft kirin û bi vê serkeftinê, di şerê navbera mirovahî û surîştê de mirovahiye qezenc kir.

DÜZGÜN DENİZ

TÎŞK

LERZAN JANDÎL



Wunciya domanê ma

Domanê ke musayena wendene de, qesekerdene de, warê motorîk de zahmetiyan encenê; yan jî qe nêşîkîne nê çîyan bimuse, gor sistemê dibistananê/mektebanê almanan, ganî şorê mektebanê ke seba nê domanan amê viraystene. Namê nê mekteban "Sendersschule" wo. Eke merdem teber ra niyado, vano, "Ma nayê de çî esto. Domanê ke nêşîkîno, ganî şero naca" La belê mesela hên niya. Domanê ke weyîrê pasaporta Tirkîye yê û şonê nê mekteban, zefîriyê xo domanê ma yê, domanê kurdan ê. Na çî ra niyanên a? Sebebê nayê zaf ê. Nê nivîsî de ebi kilmiyê nînan ser ro vinderîme.

Demo ke mi kursê Almani dene, cênîkêde kurde jî amêne kurs. La belê mi de û domananê xo de tim ebi Tirkîyê xoyo "delalî" mucul biyêne. Mi her tim çî ra vatêne; "Wayê, ti kurd a. Ti ganî zonê/ziwanê xo qese bikerê. Domanê te ganî zonê to bizanê, to bizanê, to ra fam bikerê. Meyste biro ke şî mekteb zahmetiyan encenê. Xêca naye jî ti Tirkî rind nêzana. Çîyo ke to rind nêzana, nêşîkîna bimusnê domananê xo jî." Ma di hîrê aşmî jûbînî ard berd. Peyniye de amê raye. Lê, xêlê herê mende.

Na cênîke nayê re heftê ver amê lewê mi. Çîyoke serê mi ra derbaz bî, amê virêndiya mi. Di domanê na cênîke, yê ke emser şonê mekteb, ganî şorê nê mektebo ke mi cor qalê ci "Sendersschule" kerd. Ma sebeb? Sebeb, demo ke psikologî domanan de qese kerdo, domanan cewab nêde ci. Vato, "Almani nêzanê" Tercuman ardo, ebi Tirkî domanan de qese kerdo. Wunciya domanan ra veng nêveciyo. Reng musnê ci nas nêkerdê. Suretî musnê domanan û ci ra pers kerdo, wunciya domanan ra veng nêveciyo. Nayê ser, pisikologî vato ke, "Nê hurdmîn domanî ganî şonê "Senderschuule". " Qeyî tim domanê kurda?

1. Polîtîkaya dewleta Almanî na derheq de gelê neheqa. Gor realîte, rayştiya domanan niyama viraştene, la belê gor pasaporta domanan ama viraştene. Neyê de jî înteresê dewleta Almanî, yê polîtîk û ekonomîkî estê.

2. Kesê ke na were de xebetîne, ke zefîriyê nînan jî kurd ê, seba rayştiye kar nêkerdo, seba Tirkî û dewleta Tirkî kerdo. Mamosteyêke seba dera Tirkî ebi roj û şewe xebetîyê û hêna jî xebetîne, kurd ê. Seba domananê kurda çiyê nêkenê, la belê sebetake mamostatiya zonê tirkî bikerê û ebi nayê jî peranê xo bicêrê, domananê kurdan ketê tirk, hem jî almanya de.

3. Kurdên ke ganî na derheq de wayîrê qesa biyênê, ya qe înterese nêmusna nê karî, yan jî herê mendî.

4. Ma û piyê domanan çê xo de, ebi domananê xo zonê xo qese nêkenê. Hurêndiya zonê xo de Tirkîyêde zaf xirab qese kenê.

5. Ma û piyê domanan xo a nêvînenê domananê xo de qese bikerê, dînan de mucul bê. Her çî ebi emir êno vatene, cewab jî ya "Çi" ya "Nê" ya "Hi" yan jî sere hejneyane a.

6. Ma û pî, der û cîran, bira û wayî domanan de ke qese kenê, xeletiya domanan serrayst nêkenê. Hurêndiya nayê de domanan ra bîrs bînenê. Şewqê domanan û qesekerdene şiknenê. Doman terseno ke çiyê vaco.

7. Domanî wertê pîlan de îmkane nêvînenê, ke bîr û bawariya xo, fikrê xo vacê. Çiyê ke musê, reyna bidêrê.

8. Îmkane domanê kurdan, ze domanê almanan yan jî tirkan, çînê ke wertê key de, jûbînê de zonê xo qese birerê. Jûbînê de ebi zonê xo kayan key bikerê.

9. Materyale musayen û musnayene seba domanane mektebî ra ver hem zaf kêmi yê, hem jî xebera kurdan nînan ra çîna, nêkunê ma û piyanê kurdan dest.

Nê sebeb mordem şîkîno bikero derg. La belê ez bawer a, bes ê. Karê ma ganhi çareser kerdene nê şaşî u kemasiyan bo. Wa domanê ma jî, zê domananê şaranê bînan, wayîrê îmkananê zêjûbînî bê.



Ew roj pîroz e

Payîz bû, payîzeke dereng. Serê çiyayên welêt ji berfê spî bûbûn... Li çiyên reşbelekî hebûn. Li hinek deran sahî hebû... Lê pêşiya hingê...

Pêşiya hingê, şeva reş a qetran ketîbû ser welatê me. Rojê ronahiya xwe nedida, tavê germiya xwe nedida perasiyên ji sirê girtî. Deşt û zozan, newal û çiya di nav tariyê de bûn, bêronahî bûn.... Gel dinale, erd dinale; zilm û zor hebû... Bêdengî, bêdengiya mirinê roj bi roj zêdetir dibû. Mirovan dengên xwe nedikirin, sewalan deng nedikirin, zarokan qîrîn nedikirin, gundiyan har nedikirin, nesaxan nalin nedikirin. Şev bêdeng, roj bêdeng.... Çiya, dar û ber.. Her cih û her tişt bêdeng; welat bêdeng bû, ker û kal bû... Her cih bêpejn bû, helwest nebû... eşq nebû, evîn nebû.. evîndar nebû.... tiştêk nebû... Lê êsîrî, feqîrî hebû... Dijîrî, betalî û bêkarî hebû... Zilm hebû, zor hebû... Lêdan hebû...

Bihara rengîn bêxêr û bêr mabû, gul û giya nedidan.. ava biharê boş nedibû, berf nediheliya. Bihar, bihar nebû, zivistan bû... Sosin û nesrînê bêhn nedidan, nêrgîz û asmînan reng nedidan... Alal û beybûn melûl bûn.. Rihan û binevş bêreng û mat bûn. Çu kulîlkan pişk nedidan, çiçek sor nedibûn... gulên zîba û xweşreng û bêbêhn, bêbejn, bêav mabûn... gul nedibîskivîn.. Sorgulan rengên xwe wînda kiribûn...

Şivan bêbêrî, bêrî bêzerî, zerî bêkezeî bûn li welatê min. Miha berx nedidan... Beran li welatê me ji nav kerîyan çew dibûn, nêriyan bizin nedivîyan.. Karan çûrî hilabûn... Kerî bêserûber, bêşivan û bêdûvajo mabûn... Parpar bûbû.. mih dibarîn, lê heyhat ku berx şîva guran bûn. Bêrîvan nediçûn bêriyê... Pez bêşîr, zarok bêpenêr mabûn li welatê êsîr.... Ne wilo babo, dîsa bêrîvanên me neçûne beriyê... Ew sê qol û sê kome ji nebûn .. Koma pêşiyê, pîrejin a navê navjîn nebûn... Koma dawiyê çavreş û bejnîzîrav, memikxîr û enîgewer nebûn... Ew ne yên min û te bûn.

Cotyar bêzevî, zevî bêcehî, ceh bêhesp, hesp bêsiwar bûn; mehîn canî nedîanîn. Mehîn, fîrk ne fîrka canî, hespên egîdan bû, fîrka hêstirê bû... Hêstira bédumez, hêstira bêkur... Hêstira kole, hêstira binbar heta hetayê... Mehînen kêmed ne dayikên hespên rehwan bûn... Jinên nêrekeran bûn... Li welatê min siwar nemabûn, her kes peya bû.. Kes nema li ser piştê hespan wekî egîdan.. Egîdî, an karê berê an jî wê paşê bihata.

Dayikên hejar bi dil û canî, bi şad û şahî zarokên xwe nedimijandin. Şîrê xwe yê zelal û şîrîn bi xweşî û şîrînî nedixistine hinava zarokan.. Memikên sor û spî nedidan devê zarokan... Dayik bêhest û helwest, bêken û gîrnijîn bûn, wekî giyayê payîzan zer bûbûn, zerikî bûbûn. Dayikan nedivîyan, êdî zarokan bînin ji bo koletiyê... Nedivîyan berdîlên dilê xwe bikin keraxên xwînmî-

Bi ronahiya rojê, roja zerîn û germ ku rûyê hemû zindiyan, rûyê hemû candar û bêcanên welatê min germ dibû.

Giyan di ser welatê min de dizivîrî. Bextreşî û bêbextî, zilm û tahdeyî kêmdibû. Berxwedan çêdibûn, rûyê gulên welatê min geş dibûn.

jan....

Zarokên welatê min bi kêfxweşî nedileyistin. Hemû bîrsî (birçî) û tazî, rût û rewal di nava xwelî û çiravê de li ber germa havînê tahre diçûn, li ber serma zivistanê zatûre dibûn... Xweşiya biharê hesreta dilê wan bû... Lê mixabin bihar nebû. Bihar li zarokên welatê me nedihat. Her sal, her meh, her roj, her dem li her derê welatê min sir û serma û cemidîna zivistanê bû... Zarokên min destên wan di dev de li ber dîwaran, ser li ser mil, çavsor, rû xwîrîkî bûn.. Dijminên wan hatin ew dane ber singûyan, ew qedandin. Bav û birayên wan kuştin û ew girîn û nalin... Heziqîn di nav xwe de, çûn tebiqîn.

Dijminê dahatûya welatê min mêtîyê zarokên me bi kîn û nefretan, bi xweyîtiyê tijî kirin. Zarokên wekî taka rihanê, êdî bûbûn dijminê xwe, dijminê zimanê xwe û welatê xwe. Mêrxas bû, lê çekhilgirê xelkê bû... Xew cihê xelasiya wî ya rojê bû. Lê gava dinivîstin jî dijmin di xewnê de bû... An jî bi qîre-qîra dengê top û tankên dijmin hişyar dibûn... Dijmin çî gava dixwest, di ser mala wî de digirt; dayika wî, bavê wî an jî birayê wî dibir..... Zarok digirîn, diqîrîn lê bédengî. Hal ne hal bû. Zarok ne zarok, rewşa zarokan bûbû xwelî û xebaro... Hinek ji sermayan, hinek ji german, hinek ji bîrsîtiyê, hinek, ji bêxwedanî, bêdermanî dimirin û hinek dijiyan... Ewên mayî, sed caran mirin...

Ji bo keç û xortên welatê me evîn nebû. Ji bo keçên bedew û rind, eşq nebû, ramûsan qet nebû... Çavên xwe li yarên xwe nediniqandin. Li ber dîwaran welatê me, keç û xortan heyranok nedigotin.. Evîna wan binax bûbû.. Keçikên kezîzêr, bêyî simbêlsoran mabûn... Şehîtibûn, zerikîbûn, bendewarî, nesax û gējatiyan bûbûn.. Xortan bi destên yarikên xwe nedigirtin û nedibîrin ser kanî û bîrikan, binkevîberfan, nav asmîn û yasmînan..... Keç li pişt perdeyan, li serê kuçeyan nediman li hêviya yarikên xwe. Yarên dilê wan nebûn.. Dîlber bédilêr bûn.. Dîlbera destê xwe nedihejandin.. Lewre eşq û evîn nebû, maşûq û evîndar ji bo çî bû?...

Bûkên welatê min... Bûkên enîgewer û kofixol, kiras û fistanên sor di ser bejn û bola xwe de bernedidan û li govend û dîlanan bejna xwe ya zirav nedixemilandin. Stûyê spî yê berfîn bêzêr û xişr bû... Bazinda stûra stûnî bêbazîn, piyê ahûya min bêxîrxal mabû... Navtenga zirav û bilind bêkemêr bû... Bûkên welatê min çavên reşbelek kil nedidan... Heyf e ku mamosteya wan jî li ser banan jî ranedwesta... Porê herfirî

bernedidane ser milên xwe, biskên armîsî banedidan. Berbiskên zêrîn di sindoqên bûkaniyê de ji bo rizînê mabûn... Bûka min, delala min, bêxbal û bêevîn mabû, zava berê xwe nedida çavên belek, rûyê sor û spî.. Gîrnijîna lêvên şekîrî qut û mit bûbû. Diranên mirarî kesî nedidîtin.... Giyanê bûka welatê min deqîsîbû, rûyê wê şîn bûbû, memikên wê çilmisî bû.... Umîda wê, hêviya wê nemabû.. Axeax û nalenala wê bû...

Kal û pîrên welat... ax kalo... ax pîrê.. êsîrê, bendewarê.. gihiştî pênçî-şêst-heftê saliyê.. We jiyan xwe bi stûxwarî li ser milan, bi dîlşewatî li ber kavilan, bi kutan û lêdan di zîndan de, di bin destê dijminan de borand... We jiyan xwe bi tevkuştin û dumêzqîran qedand. Rojin hêstirên wê borîn ji xwînê, rojin perariyên wê êşiyên ji derbê... Ma rojek ji bo we jî nedibû, we gotibûya "Ax dilo îro çend xweş bû, ji bo çî hûn man li ser kavişên xerab, li ser kul û kovanên xwe..." Hin caran hûn kûr-kûr dinalîn, hin caran digirîn, carinan jî diramîn... Hin caran difikirin "Ka wê roja me kengê were?... Kalo.. ji bo çî girîna kalemêr û kalejînan bédeng e? Hûn ji bo çî bi deng nagirîn?!.. Nakin qîrîn, nakin borîn... Bibêjin... Bibêjin derdê dilê xwe, belkî roja we jî were... Jiyan.... jiyan gelê kurd... Jiyan ji bo kurdan, ji bo sewal û tiralên kurdan, ji bo mişk û morî, dîk û mirîşk, pez û bizin, dar û ber, zevî û axa kurdan... ji bo her tiştê kurdan bindestî, esîrî û bendewarî bû... Jiyan ji bo kurdan bîrsîti, tarîti, zilm û zorî, tehde û lêdan û dijûn bûn... Jiyan ji bo kurdan koletî û xulamî, rêncberî û hemaliya desthelatdaran bû. Jiyan ji bo kurdan, li ser axa xwe ya dewlemend xîzanî, li ser avteziyên xwe tînîti, li ser gundên xwe mişextî... û hemû gava zikêşî bû...

Roja sor a germ, car caran tîrêja xwe diavête ser welatê min, welat germ dibû. Bi ronahiya rojê, roja zerîn û germ ku rûyê hemû zindiyan, rûyê hemû candar û bêcanên welatê min germ dibû. Giyan di ser welatê min de dizivîrî. Bextreşî û bêbextî, zilm û tahdeyî kêmdibû. Berxwedan çêdibûn, rûyê gulên welatê min geş dibûn. Lê belê ewrê reş î tarî bi haybeta xwe, pêşiya tîrêjen roja li ser welatê min digirt, sîtavkên tîrî dişikandin diqulipandin... Li dûrî welatê me roj hebû, li ser welatê me ewrê bi kêmdî û edab... Gava sîtavkên roja me dihatin şikestin, li ser welatê min bûkên baranê yên heftrengî çêdibûn. Wê demê hemwelatiyên min dixwestin bigihên bûka heftreng. Bigihên bûka heftreng da ku bextê reş biqulupînin.. Lê neyarên mirovahiyê bi hemû meca-

lên xwe, ji bo îmhakirin, qedandina gelê kurd, bi hovîti û bi awayekî dirindeyî tevkuştin û demêzqedandin, di nav kurdan de dimeşandin.

Xwînmijê kurdan nedihêlan serê kurdan ji erdê rabe. Nedihêlan bîr û bawerî û hêviya kurdan hebe. Destê xwe yê terêf û kirêt wekî zebaniyên dojhê texistine gerdana gelê min. Nedihêlan xewnan bibîne. Di xewnan de kabûs bû, dêwê heftser bû... Carinan ku serê kurdan ji binaxê derdiket, kedxwarên giyanpîs bi hemû hêzên xwe diçûn ser wan. Li Qoçgirî û Dêrsim, li Palo û Amed, li Zîlan û Agirî, li Mehabad û Helepçeyê dijminên kurdan, kurd binax kirin. Hêviyên wan, bîr û baweriyên wan, welatê wan, binax kirin....

Bi vî awayî roj û şev, meh û sal, havîn û bihar, payîz û zivistan derbas bûn. Kurd car şikestin, car rabûn, geh binax bûn, geh bi ser ketin. Carinan rûreş û bédeng, carinan rûspî û bi deng bûn. Carinan çeleng û mêrxas, carinan êsîr û bendewar bûn.. Sal borîn... Heta wê rojê... Rewşa me hinde reş, çirayê me ewqas tarî, roja me wiha windabûyî, gelê me bi carekê bêhêvî, bêmecal mabû. Li riyekê digeriyan. Rojek ji rojan, şevêk ji şevan.. Bayekî nerm û hênîk rabû, xuşîn kete nava daristanê, daristan hejiya, sewal û tiralên daristanê ji xewê hişyar bûn û lorîn. Li gel wê bayê, çem û kanî yekcar der bûn. Kevî heliyan, Ferat û Dicle şad bûn... Av herikî, di coyan de gihişte nav dehl û zevî û rezan, mêrg û çîmen bişkivîn, giya pîr bûn, gulan pîskên sor û zer dan, bêhna rihan û binevşan belav bû.. Gupîska nêrgîzan li gel alal û beybûnan vebû, melûlî şikest...

Xelk, wê rojê ji hemû rojan zûtir rabû. Roj wekî sêleke sor hate hendav. Kurdistanê û tîrêjen xwe berdane ser zindiyên mirî... Welat germ bû. Mirov germ bûn, mêtî germ bûn, dil germ bûn. Tariya zulmat êdî nemabû. Li gundan û bajaran mirov hişyartir bûbûn, bi ser xwe ve hatibûn, dikenîn, diginîjîn, distrîn ...

Kesê nedizanî çî bûye.. Lê dîsa jî îro wekî her roj nebû. Keç û xortan wê rojê bi hev re dest dabûne tivingan, bi hev re ketibûn serê çiyayên welatê xwe. Keç û xortên welatê min, wê rojê û piştî wê rojê êdî bûbûn şevreşa dijminê xwînxwar. Êdî şoreş bû. Ew roj, roja destpêka şoreşê bû. Ev roj, roja berdewamkirina nîvmayîya Bedirxan, Şêx Seîd, Seyid Rîza û Qazî bû.

Wê rojê li dijî dirindetiye biryar hate dayîn ku êdî şer bê kirin. Di roja helatî, di roja dinya germ û xweş de, biryar hebû ku welat bête rizgarkirin. Divêtin êdî welatê xwe bernedin. Êdî kurd yara xwe ji dest dernexin.

Sond û peyman hebû ku ji wê rojê pê ve heta rizgariyê, heta serxwebûnê, heta yekbûyîna welat, azadiya gel, dest ji tivingan neyê berdan... Ew roj pîroz e...

M. XALID ZÎNDANÎ

Çend gotin li ser pirtûka

Bi baweriya min, di "Mêrxas" de, tiştêkî herî balkêş, warê teknîka raxistina temaya bûyeran e. Lewre jî xala girîng ku, kurteçîrokên Polat, ji yên fantazî û romantîk cihê dike, bûyerên siyasî û civakî ne.

'Mêrxas'

MERXAS

Serpêhatiyên Kurdî

Lokman Polat



ÇN

Weşanên Çanda Nûjen

Pirtûka Lokman Polat "Mêrxas" 100 rûpel e. Di bergê wê yê pêşîn de wêneyê gerilayekî heye. Di bergê wê yê paşîn de jî çend gotinên girîng ên Medenî Ferho li ser nivîskarî û berhemen Lokman Polat hene. Çapa yekemîn a pirtûkê li Stokholmê derketiye, çapa duyemîn jî dê li Stenbolê derkeve.

Z. ŞÊXMÛS

Di van mehên dawîn de pirtûkeke bi navê "Mêrxas" derket. Nivîskarê pirtûkê Lokman Polat e. Ew di nav weşanên Çanda Nûjen de hate weşandin.

Kurteçîrokên Polat, mîna kurteçîrokên realîst hatine nivîsandin. Yanê bûyer çawa diqewime, wisa derbasî serkaxizê dibe. Pêkanî û avakirina wan, gori bûyeran çêdibe. Nivîskar Polat aliyên fantazî û romantîk girîng nabîne, tenê rastiya jiyanê girîng dibîne. Di hêla honandina bûyeran de, bi hev ve girêdana bûyeran, nivîskar metodeke baş bi kar anîye. Nirxand û qedirgirtin, hezkirin û rêzgirtina gerîla ji welat re, li ber çavên me radixe.

Medenî Ferho di nivîseke xwe de wiha dibêje: ".... Nivîskarên kurteçîrokên wekî Firat Cewerî û Lokman Polat jiyanê rojê, tevgera tîr qerqêş û tînin ber çavan." Ev yeka hanê ji bo nivîskar Firat Cewerî ne rast e, lê ji bo nivîskar Lokman Polat rast e. Çunkî, kurteçîrokên Lokman Polat li ser realîzmê, li ser rastiya jiyanê rojane ava bûne. Her çiqas bi nav, wekî çîrok bîne binavkirin jî, ev yeka hanê tu tiştî naguherîne.

Kurteçîrokên Polat bi motîfên çandî, edebî, neteweyî û rêzanî hatine honandin.

din û xemilandin. Lê yên Firat Cewerî, li ser xewnerestiyê- xeyalê, fantazî û motîfên romantîk ava bûne. Eleqeya wan bi pîrsa rastiya civakî re tune ye. Xeyalperestî, fantazî û realîzm du tiştên cihê ne, yanê li dijî hev in.

Mêrxas wekî nobedarekî Kurdistanê, bûyer û qewimînan dibîne, jê dîr nakeve. Naveroka "Mêrxas" bi motîfên çandî, neteweyî, aborî, rêzanî û civakî hatiye xemilandin û honandin. Ji serî, ta dawiyê, "Mêrxas" jiyan û berxwedaneke rojane li ber çavan radixe. Jiyan û berxwedaneke binamûs û bişeref.

Ji nav vê jiyan û berxwedana neteweyî, bala min bi gelemperî çû ser bûyerên dramatîk û trajedîk ên ku li derdora Amedê (Licê) diqewimin. Ew bûyer û qewimînên ku bi destê dewletê çêdibin, bûne sedemên xwîna hezaran. Mêrxas neşterê li vê bîrîna kûr dixê û li ser pîrsa neteweyî radiweste.

Naveroka Mêrxas pîralî ye; ew şîrove dike ku li Kurdistanê rojên giran qewimîne, gelek caran bûye reşebayî, bo belîsk û tofan rabûye. Polat diyar dike ku, tovê azadkirina Kurdistanê hatiye reşandin, her sal li dû hev ew tov hêşîn dibe, dibişkive, vedibe û şax dide.

Karê gerîla karekî dijwar e, ne karê her kesî ye. Derketina serê çîyan bi se-

re xwe mêrxasiyek e û jê tu şik nîn e.

Heger em bi temamî li naveroka hemû kurteçîrokên wî binêrin, baş bifikirin, em dê bîne ser vê fikrê, ku pirtûkên wî bi bîr û baweriya xwe, bi meram û mebestên xwe bi par ve dibin li ser komên jêrîn:

1) Kurteçîrokên li pêşberî xweşî-roşan, muxbîr, sîxur, 2) çîrokên li hemberî hovî û jakawîya faşîzmê, 3) kurteçîrokên ronahîkirina şerê çekdarî û pêwistbûna wî, 4) kurteçîrokên li pêşberî çavnebarî, dexesî û fesadiyê, 5) kurteçîrokên li ser hevaltî û hevrietiya rasteqînî, 6) li ser fedakarî û xwekustî ji bo xatîrê serxwebûna Kurdistanê û parastina karê rêxistinî, 7) kurteçîrokên evîndarî, dildarî, xerîbî, koçberî, wêrandî û sirgûnê.

Çend kurteçîrokên balkêş ên di pirtûkê de cih digirin: Mêrxas (Mahmûd Cihan), Qetlîama Navçeya Licê, Trajediyeke Ecêp, Tîtaleka Darê, Li vir Xirab dike, Mucîze, Gerilayekî Humanîst, Hevûdu dîtin, Ji sawcî Dawacî me, Reşê Mîrtîb, Mîrikê Bêbext, Ez Çek Nagrim, Bêbextî Nake, Birûsk, Rihan, Xwe Avêt Nav Agir, Keça Elewî.

Pîrozbahiya salvegera parlamentoyê

MEDENÎ FERHO



Bêguman neteweyî, bi sazî û dezgehên bilind û tevgera bingeîn a komeleyetî tê lidarxistin. Bêhtir ji her gelî, hewcehiya gelê kurd bi van avanî û dezgehên heye. Lê, bi avanî û dezgehên bi rêkûpêk û xwedî xîreta hemdem... Ku dikaribin bersiva demê û daxwazên komên xelkê bidin. Ji bo ku karibin, barhîlgirtina aborî, çandî, hunerî, zanistî û leşkerî pêk bînin û di honandina neteweyî de bibin masulke.. Dikarin karê tevgera xwîne di nava ezayên laşê neteweyîtiyê de bi karkeriya rawerîn û rabinin bikin. Komên xelkê kurd di bêzariyeke mezin de ne.. Di qonaxêke nezişk de ne. Ev qonax di tixûbê têkçûn û têgihîştinê de ye.... Ev sazî û dezgehên neteweyî îro çiqasî misrî û xizan bin jî, di pêşerojê de dirokiya van gavên girîng û mezin wê bêhtir bîne xuyakirin.

Stûna neteweyî ya herî gur û geş (piştî

leşkerî) û darîçavan parlamentoya kurdî ye. Sal qediya.. Salvegera Parlamentoya Kurdî ya li Dervêyî Welat roja 12'yê avrêlê hate pîrozkirin. Helbet rojeke dirokî bû. Girîngiya pîrozkirina vê salvegerê wekî roja damezirandina wê giranbiha bû. Destpêk (12, avrêl, 1996, Denhak), bi rêkûpêkî û bêhtirîn bi hêz li ser piyên xwe rawestiya ne û karên neteweyî pêk anîne. Karê herî mezin ew e ku pir netewe berhembêz kirine, ya duduyan jî, bêguman berhembêz kirina Kongreya Neteweyî ye.. Di vê hêlê de jî, gavên pêwist û mezin hatine avêtin..

Her roja ku diçe jî, di karûbarê vê avaniyê de, pêwistî û girîngiya wê, ji teref rêxistin û sazî û kesên ve çêtir û pirtir tê fêmkirin. Îro jî, ragihandina min ew e ku di hêla xaziyan de, gavekê biavêjin. Kêmasiya wê roja giranbiha beşdarnebûna xaziyekeî/ê û dayîkeke şehîdekî/ê bû. Birêz Yaşar Kaya û birêz Zübeyr Aydar ku di her hêlê de hay ji tiştan hene û xwedî baldan in, çima ev karê girîng û pêwist pêk neanîn? Ev kêmasî ji ku derê hat? Bawer dikim ku berî her tiştî, divê ku nixandina van cengaweran pêk bê. Yekî din: Helbet di dilê komên xelkê de textê zêrîn yê payidariyê hatiye

raxistin. Lê di cihgirtina destûrî de û payidariya ji teref parlamento ve dibe nixandineke taybet û dirokî..Dema vê gavavêtinê hatiye..

Wekî tê zanîn, çî xazî û çî şehîdên Kurdistanê, heya îro mane gula ber bêra di erdê de.. Nixandina destûrî, wê mêrxas û cengawerên kurdî, ji dilojarê xelas bike û tîxe xelesa pîroziyê. Ji ber ku ev nixandîna êdî di pirtûkine cihê de jî cih digire. Her dilopa xwîna wan di nava gulbijêrk û gulbengiyên helbestî de tê nixandîna.

Kurdistan warê şehîdan e..

Warê şehîdan, kela û birca dilan ya pîroz e..

Ya duyemîn: Gavavêtina Kongreya Neteweyî ye ku rêxistin û sazî û kesên berhembêz bike. Îro, ne roja nakokî û zexelî û zikreşiyê ye.. Pêwist e ku parlamento, ber bi kes û saziyên kurdî ve gav biavêje.. Bêguman kes û sazî hene ku direvin.. Sedem çî be, karbendiya parlamentoyê avakirina yekîtiyê û berhembêziya aştîya navbera kurdan e. Ku parlamento karê xwe kir, êdî, şermezarî para kesên din dimîne..

Dilxwaziya me, piştî çalakî û kar, helbet fraze yeke rûmetî ye! Hêvî û pêwistî ji serkevtinê e!..

E di çirokên me bi "hebû tune bû" dest pê nakin. Êdî evîndar ji hesreta hev naşewitin, ji ber ku êdî li dinyayê teknolojiyeke xurt heye, ji ber ku êdî INTER NET heye. Belê Melehet di nameya xwe de gazinên xwe tîne ziman û li ser çalakiyên Samet disekine, lê samet gelek bibiryar û bisebir e.

Samet dibêje ku hikûmeta Anayolê piştigirîya Evdilkadir Beg bike, wê helbet rojekê ev hikûmet jî xera bibe, lê heke kurd piştigirîya wan bikin, ewê helbet rojekê bigihîjin mirazê xwe.

Evîna Melehet û Samet niha jî bûye mijara HABITAT'ê. Melehet û Samet difikirin ku wê xwe bi HABITAT'ê baştir bidin nasîn û êdî her kes wê behsa evîna wan a mezin bike. Evîna Melehet û Samet çiqas mezin dibe, nûçeyên derewîn ên li dijî wan jî roj bi roj zêdetir dibin.

Li gorî agahdariyên Reuters'ê bere-dayên navneteweyî Helmut Kohl û Klaus-Kinkel jî aliyê Samet ve hatine tehditkirin. Li ser vê nûçeyê sosyolog û psikologên şer ên bi nav û deng jî dibêjin "Heke çavê Helmut Kohl û Klaus Kinkel di Melehetê de hebe ev bûyer rast e û xelasbûna van her du kesan jî tune ye." Belê êdî Samet nameya xwe ya dawî dişîne.

—Evîndara min a birêz, ez difikirim ku kurd li evînen xwe xwedî dernakevin. Min niha jî şûna te, ji yeke îngilîz

hez bikira, ez niha jî zû ve gihîştibûm mirazê xwe. Mûsayê belengaz yê Meraşî çawa gihîşt Sarahê. Binêr wa ye Yavuz Özkan ji bo wan filman çêdike, lê hunermendê me nikarin ji bo me tiştekî çêbikin.


Evîndara min a birêz, bibore, niha telefoneke me heye, dixwazî ez vê telefonê bigirim, paşê, ezê nameya xwe bidomînim.

Samet: Elo şev baş.

Telefon: Elo elo.

Samet: Elo em dengê we dibihîzin, kerem bikin.

Evîna Fermî (3)



Telefon: Heval şev baş, ez ji Konyayê aramîş dikim, silavê xwe ji Evdilkadir Beg re dişînim, di evîna te de, ji te re serkeftinê dixwazim.

Samet: Hûn ji Melehetê re mesajekê dişînin?

Telefon: Heval ez ji xwişka Melehet re serkeftinê dixwazim, ez ji xebatkârên mala we re jî serkeftinê dixwazim, û pir teşekur dikim şev baş!

Niha telefoneke me ya din jî heye, dixwazin em vê telefonê jî bigirin.

Samet: Elo şev baş!

Telefon: Şev baş heval!

Samet: Kerem bikin heval! Hûn mesajekê dişînin ji Melehetê re?

Telefon: Heval eyb e, şerm e, fedî ye ev çî ye, her kes derdikeve behsa evîna te û Melehetê dike, Melehet nayê bila neyê heval, heta cihenemê rîya wê heye, ma qey meseleyeke me ya din tune ye. Ka ez behsa evîndara xwe dikim?

Samet: (Bi hêrs) — Elo, elo, tu kî yî? Elo, elo navnîşana xwe bide min ulen! Tu çawa van tiştan ji Melehetê re dibêjî? Elo, elo, elo, ulen elo!...

Me got hunermendên me li me xwedî dernakevin, Teatra Jiyana Nû nikare li ser evîna me listikekê çêbike, ji bo Fikriya Şimikreş û ji bo qîza yuzbaşî listikan çêdikin, lê ji bo me nikarin tiştekî bikin. Evîndara min a birêz, binge-ha evîna me wekhevî ye, yanê ez nikarin bibim kûçikê ber destê te, ez nikarin bibim qurbana binê lingên te.

Evîndara min a birêz, rewşa teatristên me ev e, hozan û stranbêjên me jî ji xwe ditirsîn ku behsa evîne bikin. Belê evîndara min a birêz, ez dixwazim dawî li vê evîne û li vê jiyane binim, heke tu bersiva min a pozîtîv nedî, ezê heta sê wextî û heta sê şefeqan xwe berdime Behra Spî û ezê jiyana xwe ya mayî li Misirê bidomînim. Ji pisîka mala we re spas dikim û her du çavên wê yên kesek maçî dikim. Bimîne di nexweşiyê de.

Dawî.

AMED MAHSUM

XELAT...

Herfên Peyva Veqarî	E	A	O	Î	U	Y	Ç	Ş	Q	W	X	Z	Yên
Herfên Peyva Veqarî	A	R	I	Z	T	K	E	S	E				
Herfên Peyva Veqarî	E	N	I	S	K	E	G	I	T				
Herfên Peyva Veqarî	T	B	N	M	I	A	M	A					
Herfên Peyva Veqarî	E	L	E	G	S	A	L	A	R				
Herfên Peyva Veqarî	Ü	Ş	T	E	B	A	S	N	I				
Herfên Peyva Veqarî	E	A	R	I	E								
Herfên Peyva Veqarî	E	M	E	L	T	Y	A	T					
Herfên Peyva Veqarî	O	L	C	A	T	A							
Herfên Peyva Veqarî	H	X	A	N	E	T							

PEYVA VEŞARÎ

Bersiva Xaçepirsê (12)

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihîjin me, emê wan binirxînin û bi rîya pişkê li 10 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 14'an kitêba **Firat Cewerî** "Kevoka Spî" ye.

Jêrenot:

Ji bo ku bersiva we bê nîrxandin, divê hûn "Peyva Veqarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.

KEVOKA SPÎ

Firat Cewerî



Kesên ku xelata xaçepirsa 12'an kasete **Şivan Perwer** "Nazê" qezenc kirine: **Baran Tektaş/Istanbul**, **Şükran Dora/Adana**, **Faruk Kümet/Batman**, **Bahar Balcı/D.bakır**, **Rengin Yüce/D.bakır**, **Muhsin Turan/İzmir**, **Murat Durak/Batman**, **Selman Timur/Bartın**, **Mukaddes Kubilay/İzmir**, **Burhan Uçar/Mardin**

XAÇEPIRSA BIXELAT (14)

XAÇEPIRSA

Lêkolînerê kurd (wêne)	Fêkiyek	Ciwan	Oksîjen	Notayek	Notayek
Malxwey	Sembola zirkonyûm	Zindibûn	Gel, xelq	Sala borî Sembola Mendelev- yûmê	
Sembola iridyûmê	Nehoste	1		Xwarîna me ya bingehîn	
Paşgîrek	Genimê hêrandî				Bi almanî "erê"
4	Şofêr				
	Dînî				
Rabirdû	2		Bazar	Deng	9
Dert, elem				Xwedbinî	
	Îfîtra				Bersiva neyînî
	Yezdanekî Misrî				
Enstrûma neke antîk		Bexçeyê tîrî			
Gihane- kek		Sebzeyek			
	Gopal		5	Sembola Osmiyûmê	
	Paşgîrek				
Benîk		Sebzeyek			
Gihane- kek	3				
	Cihê ku tavê nabîne				

PEYVA VEŞARÎ

1 2 3 4 5 6

●TC ji bo şahiya 23'ê avrêlê ji hemû neteweyan zarok dawet kirin. Ji xeynî neteweyekê.



Divê em hez ji zimanê xwe bikin

Min bi rojnameya Welatê Me dest bi kurdî kir. Niha ez bi hêsanî hemû weşanên kurdî fêm dikim. Lê, axaftina min hê ne baş e. Ez ji bo hînbûna zimanê kurdî li ber xwe didim. Bi piranî ji ez bi ser dikevim. Ez bi kal û pîran re dipeyivim. Ji bo çîrok û metelokên kevn ez ji wan re dipeyivim. Divê hûn hejmarên nivîs-karên xwe zêde bikin. Çima mirovên me bi kurdî napeyivin? Divê hûn li ser vê kûr û dirêj bisekinin û di rojnameyê de binivîsin. Hinek dibêjin: "Mirovên me girîngiya zimanê xwe fêm kirine." Lê bi min, ewqas bi hûr û kûr fêm nekirine. Mirovên me li derveyî welat in, dîsa jî bi tirkî dipeyivin.

Divê hûn naveroka rojnameyê dewlemantir bikin. Li ser psîkolojiyê, psîkanalîzê, polîtîkayê jî bisekinin. Pîrsa zimanê me gelek girîng e. Mirovên me yên ji zimanê xwe fedî dikin, bi piranî dibêjin: "Zimanê kurdî zimanekî feqîr û bêmantîq e." Divê bê zanîn ku, ger mirov ji zimanê xwe hez bike, welatparêzbûn gelek hêsan dibe.

Rojekê li dora min gelek mirovên di nav

Ez xortekî şoreşger û sosyalîst im. Lê, ez eniyeke dorfîreh diparêzim. Ez ji malbateka alewî tîm. Bi min, kurdîstaniyên ku, tahammûla dîn û mezhebên din nakin hê nebûne kurdîstanî. Hemû çand û raman, kulîlk in. Divê bîne parastin.

sîstemê de hebûn. Min qala zimanê kurdî kir. Min qala rêzimanê kurdî kir. Mirovek ji leşkeriyê hatibû. Sibê çû Rojnameya Demokrasi stand, berê tim digot: "Ew hemû terorîst in." Zimanê ku hatiye talankirin, kesîtiya ku hatiye talankirin e. Têkoşîna me gelekî mafdar e. Ku me rastiya xwe hûr û kûr eşkere kir her kes wê me fêm bike. Ez bi hemû dilê xwe bawer dikim. Bi ya min, divê hûn di bergên rojnameyê de resimên (wêne) resamên kurd bi kar bînin.

Mirov û nivîskarên naydar jî bila nivîsên xwe bidin wergerandin û tevî we bibin. Çima Rojnameya Demokrasiyê cih nade kurdî. Divê hin rûpelên xwe bi kurdî amade bike. Divê rêxistinên kurd, kovar û weşanên xwe li gorî berê pirtir bi kurdî biweşînin. Ên ku nivîsên wan gelek tîne xwendin, divê

edî bi kurdî binivîsin. Em bi piranî dibêjin ku em azad bûn, emê hingê bi zimanê xwe binivîsin û bixwînin. Ev jî, bi min, şasiyeke gelek mezin e, xwe xapandin e.

Ez xortekî şoreşger û sosyalîst im. Lê, ez eniyeke dorfîreh diparêzim û li Abdûl-melik Fîrat, Altan Tan silav dikim.

Yek jî, ez ji malbateka alewî tîm. Bi min, kurdîstaniyên ku, tehemmûla dîn û mezhebên din nakin hê nebûne kurdîstanî. Hê girîngiya doza neteweyî fêm nekirine. Hemû çand û raman, kulîlk in. Divê bîne parastin.

Roman û çîrokên kurdî gelek hindik in. Em li her derê li weşanên kurdî digerin. Weşanên ku li Swêdê derdikevin, çima li Tirkiyeyê jî dernakevin?

RÊNAS DILOVAN

xwendina xwe bidomînin.

Dewleta tirk, bi her awayî dixwaze mîna şeytên bikeve mîjîyê zarokên kurd. Ev şîlaneke ji şaxên dîroka wan e; zarokên gel ên biyan berhev dikin, dawî jî bi perwerdehiyeke nemirovî wan mezin dikin. Di dewsa medreseyan de "Îmam Hatîp" ava kirin. Hunera "Yatılı Okul" ên wan jî îro edî baş xuya ye. Bi sedan xort û keç li ber deriyê dersxaneyan pejmûrde dibin.

Hin dersxane bi taybetî li bajarên Kurdistanê hatine avakirin.

Keç û xortan li ser şaxên oldariyê perwerde dikin, lê ev nerast e, dereweke hişk e. Dewleta tirk tu car jî me re rast û durîst nebûye. Hişk xortan bi nîjadperestîya tirkî dan digire.

Gelo em li hemberî van afatan li zarokên xwe xwedî derdikevin? Belê ew zarokên ku eylo hildidin, wê di pêşerojê de wekî Kamranan, wekî Hikmetan bibine gur û dê li welatê xwe vegerin.

Di psîkolojiyê de tespîtek wisa heye: zarokê heta panzdeh saliya xwe bibe xwedî

çi xwiya jî sedî çil wî xwiya, heya mirinê bi xwe re dibe.

Zarokên me heya panzdeh saliya xwe çi xwiya, çi hezkirinê, çi perwerdehiyê, çi kesayetiyê, jî kê û li ku deverê distînin?

Em bes li zarokên xwe nebîne miqate, ji wan wê Yezîd derkevin, wê M. Nuri Yılmaz derkevin. Divê pêşî em mamosteyên zarokên xwe bin. Em dikarin dilên zarokên xwe li xwe û welatê xwe germ bikin. Heya niha ji neçariyê û bê saziyan guran dev dikirin stûyê zarokên me. Lê belê îro hem saziyên me hene, hem jî navgînên me. Di warê weşanê de jî tav hêdî hêdî li me germ dibe.

Ger em li bername û pirtûkên tirkî baş binihêrin camêran, li nava çavên me dinihêrin û ji me re xeberan didin. Me li bapîrên me û welatê me dikin dijmin. Ji hêlekê ve dema yek li zarokên me dide, em radihêjin dar û çoyan, heta carinan jî radihêjin çekan, ji aliyekî ve jî em zarokên xwe diavêjin devê ziyayan (marên mezin).

ÇIHAN ROJ

Zarokên xwe neavêjin devê ziyayan

Beriya çend salan Turgut Özal wiha gotibû: "Divê mirov li zarokên jîrek xwedî derkeve. Binihêrin her rêber û serokên çawa ji wan derdikevin!" Li ser navê, "Süper Zekalı Çocuklar Okulu" angî dibistana zarokên herî bîrbîr, dibistan da vekirin, mebesta wî ew bû ku zarokên jîrek ên bijarte têxe bin xizmeta pergale.

Dîsa beriya bi demeke nêz, li ser navê "İnanç Vakfı" ji rêvebiriya dibistanan hate xwestin ku, ji her dibistanê du heb zarokên jîrek bînin tespîtkirin, destûr jî dê û bavê wan bibe xwestin, da ku ew di lîseyê weqfa olê de

Rojnameya Hefteyî
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
Zerya Basın ve
Yayınçılık
San. Tic. Ltd. Şti. adına
Xwedî (Sahibi)
CELALETTİN YÖYLER

Gerînendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
MEHMET GEMSİZ

Heyeta Weşanê
(Yayın Kurulu)
AYNUR BOZKURT
SAMİ TAN
RAHMİ BATUR

Berpîrê Karên
Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
DÜZGÜN DENİZ

Berpîrê Saziye
(Müessese Müdürü)
TAHIR ELDEMİR

NAVÎŞAN
Ayhan Işık Sok. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL

TEL-FAX
293 53 19 - 251 90 13

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık
A.Ş.

BELAVKIRIN
Birleşik Basın Dağıtım
(BBD)

NÜNERİTİYÊN ME
(Temsilciliklerimiz)

Nimînendeyê Giştî
yê Ewropayê:
Mazhar Günbat

Suriye:

Jan Dost

Berlin:

Silêman Sido
49-30-69002695

Hannover:

Selîm Biçûk
49-5721-81360

München:

Mahmut Gergerli
49-871-670884

Atîna:

Ferhan Zêbarî
30-13634905

Brüksel:

Medenî Ferho
32-02-466037

Stockholm


Robîn Rewşen
46-8-7510564

Badenwurttemberg

A. Rahim Ayaz
49 75 45 91 10 42

Çiyê zarokên kurdan kêr e?

Gelo bi rastî jî, ji her neteweyî zarok, dikarin beşdarî vê pîrozbahiyê bibin? An jî, ji bo pîrozkirina vê cejnê ji zarokan çi tê xwestin? Zarokbûn tenê ne bes e gelo?



Ey pepûk jî mîna ku bav û bapîrên xwe yên ku bi hezaran salan e ji her mafê xwe bêpar mane, hêstiran dibarîne.

“23 NISAN”

Her sal di vê tarîxê de (23'ê Avrêlê) li Tirkiyeyê “Cejna Zarokan” tê pîrozkirin. Ev cejna ku xwedêgiravî Atatürk diyari tevî zarokên dinyayê kiribû.

Bi sedema vê pîrozbahiyê, ji her netewe(!) û temenî, zarok tî ba hev û vê cejnê pîroz dikin. Mîna fransîz, îngilîz, îspanyol, îtalî, bulgar, yewnan, portekîz, rûs û hwd.

Gelo bi rastî jî, ji her neteweyî zarok, dikarin beşdarî vê pîrozbahiyê bibin? An jî, ji bo pîrozkirina vê cejnê, ji zarokan çi tê xwestin? Zarokbûn tenê ne bes e gelo? Ji bo pîrozkirina vê cejna zarokan (!) pîvan çi ne? Divê 5 salî bin, 7 salî bin an 13 salî bin? Divê çavşîn bin an çavreş bin? An jî divê porzer bin û bejnurt bin? Ji bo îspatkirina zarokbûyîne çi pêwîst e gelo?

Îro li dinyayê zarok, li her derê zarok in. Dema li cihekî zarok bin, li cihekî din, ne mezin in û ji aliyê hemû însanan ve tê qebûlkirin ku zarok in. Her çiqas li hin welatên lipaşmayî zarok zû ji zaroktiya xwe dûr dikevin jî, bi giştî li dinyayê dişa wekî zarok tî qebûlkirin.

Lê belê ji bo beşdarbûna vê cejna zarokan ku li Tirkiyeyê tê pîrozkirin, her hal zarokbûn ne muhîm e. Madem wisa ye ji bo çî nav lê danîne “Cejna Zarokan a Navneteweyî”. Madem wisa ye zarokên kurdan çima nikarin beşdarî vê cejnê bibin û bi zarokên din re bilîzin? Ma ew ne zarok in? Ma mafê zarokên kurdan wekî zarokên ji neteweyên din nîn e? Gelo çima ev serîlêdana zarokên “Gulên Mezrabotan” a ji bo pîrozkirina vê cejnê nayê qebûlkirin? Gelo çima zarokên “Gulên Mezrabotan”, ku ev du-sê sal e li ser hev, serî li saziyên dewleta tirk didin ku ew ji beşdarî vê pîrozbahiyê bibin, ji deriyê cihê ku cejn lê tê pîrozkirin, tî qewirandin?

Gerçî mirov li vê sistema kirêt a Tirkiyeyê binêre, divê mirov zêde jî şaş nebe. Çunkî bi saya van polîtîkayên qirêjî û durû yên Tirkiyeyê, çawa bav û bapîrên kurdan ji mafên xwe yên însanî bêpar mane, zehf normal e ku îro jî zarokên kurdan ji mafekî bi vî rengî bêpar dimînin. Ma ne ji ber wê bîdadiyê ye ku kurd ne li welatê xwe, li welatên xerîbiyê jiyana xwe didomînin. Gelo dijîn an na najîn? Jiyanekê ku her roj bi hesreta welêt û cihê bav û kalan tê borandin çiqas jiyana e? Ew welatê wan î ku dewletên dinyayê tev de li serê şer dikin û dixwazin xwedîtîyê li wan deran bikin. Lê belê tenê nayê xwestin ku kurd xwedîtî li welatê xwe bikin. Hem jî ew gelê ku bi hezaran salan e ku tê de jiyane û ji bo wê derê xwîna xwe rijandine.

Mixabin kurd, ji welatê xwe hatine dûrxistin. Li metropolan belav bûne û bi awayekî rojane jiyana xwe didomînin. Heta ew xistine wî halî ku, zikê xwe nikaribin tîr bikin. Zar û zêçên kurdan ên ku bi taybetî li metropolan dijîn, an ketine pey nanê xwe, an jî bêîş û bêkar li sîkan digerin.

Divê her netewe hay ji nîfşên nû hebin, ango li zarokên xwe baş xwedî derkevin. Ji ber ku berdewambûna neteweyan bi nîfşên baş mimkun e. Dîrok jî baş hînî me dike ku gelek netewe, ji ber ku xwedî li xwe û zar û zêçên xwe derneketine, ji holê rabûne.

AYNUR BOZKURT